## Wêjeya bêxwedî ya kurdên Sovyetê!

Kurdên Kafkasyayê dengê xwe nikarin ji çemê Erezê virdetir ragihînin, gelekên wan jî mirine. Eger peyrewên mîrata wan destûreke wiha dabûne wan, mafê wan jî tune ye, ji ber ku berhem tenê ya nivîskarê wê ye; çi be ew e, resen e, kes nikare kêm û zêde bike... ***Yaşar Eroglu / R.5***



## Kurdeçîrokê dest bi weşanê kir

Li bakurê Kurdistanê kovargeriya kurdî di dîroka ziman, wêje û siyaseta kudî de cihekî pir girîng digire. Dikare bê gotin ku kovargeriya kurdî bandoreke pir baş li ronakbîriya kurdî kiriye. Kovara Kurdeçîrokê di Newroza îsal de dest bi weşana xwe kir... ***R.11***




# xwebûn

22-28 ADAR 2021 HEJMAR: 66 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Parêzeran xwest CPT bi lezgînî peywira xwe bi cih bîne




Piştî îdiayên li ser medyaya civakî yên der barê rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de parêzer, saziyên civakî, partiyên siyasî bangewazî li rayedarên dewletê kirin ku bi Ocalan re hevdîtineke rûbirû pêk bînin. Parêzeran got ku îdia dibin sedema fikaran û ji bo fikar ji holê bên rakirin divê deriyê Îmraliyê li kontrolê vekin û bi Ocalan re peywendî were danîn û serdana hevdîtinê were qebûlkirin. Serlêdanên parêzeran bê bersiv man û parêzeran bang li CPT'ê kirin ku bi lezgînî peywira xwe bi cih bîne... ***R.3***

## Demildest hevdîtin

Li Kurdistan û gelek deverên cîhanê ji bo Ocalan çalakî hatin lidarxistin. Li Amed, Stenbol û Îzmîrê gelek saziyên civakî daxuyaniyên hevpar dan û xwestin demildest bi Ocalan re hevdîtin were kirin. Her wiha parlamenterê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan serî li Wezareta Dadê da û xwest ku fikar ji holê bên rakirin... ***R.3***

# Newroze ti çi şêrîn a

Ma her serre paweyê ameyîşê Newroze yî û ma zanenê ke a her serre newe ra ganî bena û yena. Her serra ke wesar yeno zî kelecanêko pîl dano ma pêronan. Çimkî nê demserrî de roşanê kurdan Newroze yeno bimbarekkerdene. Wisar heme rindekîya gerdûne mîyanê xo de hewêneno û heme gandaran reyde bare keno... ***Helîn Uzel / R.9***



### *Li her derê agir hat pêxistin û hesab ji zaliman hat pirsîn*

*Bi rojan e li kolanên Kurdistanê agirê Newrozê tê pêxistin û bi pîrozbahiyên girseyî coşa Newrozê derket lûtkeyê. Kurdan wekî her sal îsal jî bi çalakiyan hatina biharê pêşwazî kir. Di Newrozê de nemaze tecrîd û zextên li ser HDP'ê hatin şermezarkirin. Careke din hesab ji zaliman hat pirsîn ku dê li hemberî zilmê serî netewînin û her tim li ser pêyan bin.*

## Newroz hat bi awirên xwe yên Medyayî!

Li me dinihêrin, ji serî heta binî, ji dil heta mêjî. Awirên me şikestî ne gelo yan behozî? Xeyalên me kedîkirî, rastiyên me hêsirbûyî ne yan na? Kelecan, hêvî û serfiraziya Medyaya azad çiqas heye bi me re çiqas nîn e? Newroz hat. Bi awirên xwe yên Medyayî li tevî malan digere, li tevî kolan û bajaran çirûskek datîne dilê me, kurdîtiyek ronî û dilşad... Gotinek me dibêje "sal bi sal xwezî bi par" em bêjin Newroz bi Newroz, xwezî bi îsal? Em ê karibin bêjin? Lew baş bijîn jî nejîn jî Newroz, cil û bergên me yê yekane, rajena me ya jiyanî ye. Ger em ji Medyayê ve Newrozîn bixwiyên dê agir îsal helbestan bixwîne di guhên me tevan de. Ka em destên xwe bihejînin ji wan re û bi serê xwe yê berz, azadiya xwe bigihînin heta ba wan. Jixwe digel strana "Newroz tê, li sûka Ma habadê".... ***Mizgîn Ronak / R.2***

## Aqilê Xoceyê Xasî

Erê her kes zano Xoceyê Xasî mewlûd açarnawo kirmanckî, ma qalê ene joy nêkerin. Ma qalê aqilê ê, jiyaney ê, tesîrê ê ro dewrê cê, dewanê dewrê Hezanî (dewey Liceya Amedî) bikerê ke wa baş bêro famkerdişî. Eno hefte nimûneyke ma esta. Ene nimûne aqilê ê, tesîrê ê ro dewrê xo nîşan dana. Fermo ma dest pa bikerin. Vanê merdimê ke zehf xeberî dayêne, hema çi biyameyêne fekê cê, bê ke biwezno, bê ke sero bifikirîyo hema vatêne...***Cemîl Oguz / R.9***




## Li meclisê nobed

Piştî ku parlamenteriya parlamenterê HDP'ê Omer Faruk Gergerlîoglu hat betalkirin li meclisê çalakiya Nobeda Demokrasiyê hat destpêkirin. Gelek siyasetmedar bi serlêdanê piştgiriyê didin çalakiyê.

## Darbeya siyasî berdewam e

Li hemberî HDP'ê û siyaseta demokratîk zext û êrîş zêde dibin. Serdozgerê Komarê yê Dadgeha Bilind Bekîr Şahîn, ji bo HDP bê girtin serî li Dadgeha Destûra Bingehîn da. Li aliyê din di îdianameyê de ji bo 687 HDP'iyan biryara qedexeya siyasetê tê xwestin. Piştî ku doza girtinê hat ragihandin hevserokên HDP'ê Pervîn Bûldan û Mîthat Sancar demildest bertek nîşanî biryarê dan û gotin ku ev darbeyeke nû ye û dê berxwedana xwe ya demokratîk bidomînin û li hemberî zextan serî netewînin. Piştî ku biryara girtinê hat ragihandin gelek kesan li ser medyaya civakî piştgirî dan HDP'ê û bertekên tund nîşanî AKP'ê dan. Di serî de Xebata Tifaqa Kurdistanî gelek sazî û dezgehan piştgiriya xwe ya ji bo HDP'ê ragihandin. Mijar di qada navneteweyî de jî deng veda... ***R.3***

## Nivîsandin û çend pirs

Ezbenî! Her çiqas nivîskarî ji der ve hêsan xuya be jî, lê bi rastî ew wiha jî zehmet û zor e. Eger nexwîne û nenivîse, nexweş dikeve! Kesê ku karê nivîskariyê bike û bixwaze di nivîskariya xwe de berdewam be, divê bi şev û rojê bi peyvan re şer bike! Dinya li serê wî dibe wek tara bêjingê û hundirê serê wî dibe wek qada şer. Ku şer neke, nivîskarekî mirî ye! Erê ezbenî! Tu kes wek nivîskar ji dayika xwe re çênebûye. Încex mirov bi xebata salan dibe nivîskar. Ji bo hînbûna pîş û sazekî neh-deh sal dem ji miroveKî re divên. Ji ber ku nivîskarî ji gelek pîş û sazan zortir û zehmetir e... ***Konê Reş / R.5***

## Misir xwe giran dike

Tirkiye ji sala 2013'an ve piştî çûyîna Muhammed Mursî bi Misrê re hemû têkiliyên xwe bi dawî kiribûn û bi siyaseteke tund dijberiya Abdûlfetttah Sîsî dikir. Tirkiyeyê bi vê nêzîkatiya xwe ya li hember Misrê navbera xwe û Erebistana Suûdî jî xera kiribû. Piştî 8 salan polîtîkayên Tirkiyeyê yên li hember Misirê di derbekî de guherîn û Tirkiyeyê xwest bi Misirê re hevdîtinan bike. Rojnameger Şiyar Zaxo der barê destpêka hevdîtinên Misirê û Tirkiyeyê de ragihand ku bi israr û daxwaza Tirkiyeyê pêk hatine û Tirkiye dê di encama van hevdîtinan de tiştên ku dixwaze bi dest nexe... ***R.7***

## Yezdanên welatê jorîn [2]

Ger hûn bixazibin bi dilê xwe li cih warên Ûrartûyan bigerin, divê hûn Wanê ji xwe re wekî navend bibijêrin. Lewra Wan, nîvê kevçika dilê Ûrartûyan e. Ewil biçin ber Dergehê Yezdan Xaldî û wî dergehê pîroz tewaf bikin. Bi rêzdarî li ber bîrdariya seryezdanê cengê Yezdan Xaldî, yezdanê ba, bager û birûskê Yezdan Teîşeba, yezdanê rojê Yezdan Şivînî, her 60 yezdanên din û her 16 xwedawend, li huzûra wan niyaz bibin û têkevin qametê. Çiqas diayên hûn pê dizanin ji hezkiriyên xwe re bixwînin. Piştî hingê daxilî tunêla dem û dewranan bibin... ***Agît Yazar / R.12***

# Cejna biharê û şopên lehengan

Eylem Şoreş

Hatina biharê ji bo hemû gelan xwediyê wateyek cuda ye. Ji bo kurdan sembola serhildanê ye 21'ê Adarê. Ev roja Newrozbûna jinên kurd e. Vê mîrateyê jî sal bi sal jinên kurd zindî dihêle û jin xwedî li mîrateya serhildanê derdikevin. Dîroka kurdan bi çîroka Kawayê Hesinkar tê nasîn. Bi berxwedana ku bi pêşengiya Kawayê Hesinkar a li dijî qralê Asûr Dehaq hatiye destpêkirin 2 hezar 3u 633 sal berê, agirê Newrozê yê ku hat pêxistin îro jî wek sembola berxwedanê tê binavkirin.

Di sedsala 20'an de jî lehengiya Kawayê Hemdem Mazlûm Dogan ji bo gelê kurd bû sembola berxwedanê. Di salên 90'î de bi hezaran kes di bin qedexeyan de ketin qadan û bi canê xwe li kolan, tax, navçe û kolanan Newroz pîroz kirin. Gelê berxwedêr heya roja me ya îro li ser şopa lehengên xwe dimeşe û bê sekn xwedî li vê mîrateyê derdikeve. Agirê Newrozê bi taybetî jî ji aliyê jinên kurd ve wek serhildana li dijî zilm û neheqiyê tê pêxistin. Jinên di Newrozan de bedena xwe kirin meşaleya azadiyê, wateyek cuda didin cejna berxwedana gelê kurd. Zekiye, Rahşan, Ronahî, Bêrîvan, Sema û Elefteriya hinek ji jinên ku bedena xwe kirin meşaleya azadiyê ne.



## Jinên kurd êdî jiyana azad nas dikin

Zekiye Alkan di demeke ku tarîtî bi ser Kurdistanê de anîbûn, li ser sûrên Amedê bedena xwe da ber agir û meşaleya azadiyê pêxist. Meşaleya dest bi dest geriya vê carê li metropolên Tirkiyeyê hat pêxistin. Zekiye di 21'ê Adara 1990'î de ji bo bibe bersiva berxwedana jinên Nisêbînê diçe ser sûrên dîrokî yên Amedê û bedena xwe dide ber agir. Zekiye wek jina kurd a lêgera azadiyê tê zanîn. Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji bo Zekiye Alkan gotibû: "Çalakiya Zekiye Alkan ku bi agirê azadiyê bilind bûye, di Newrozê de agir berda bedena xwe, sembola nehêsaniya azadiyê ye. Jinên kurd êdî jiyana azad nas dikin."

**Bi agirê bedana xwe bû bersiv**

Jineka din a ku bûye sembola cejna berxwedanê Rahşan Demîrel e. Ew di sala 1992'yan de li Îzmîrê li dijî qedexeyan bersiva herî mezin a 'Newroz wê bê pîrozkirin' da. Rahşan di temenê xwe yê biçûk de zextên dewletê ferq dike û hêrsa wê mezin dibe. Zextên dewletê weke sembola Dehaqê demê dikarin werin dîtin ango heya îro jî ev Dehaqên demê dest ji lîstokên xwe yên li ser gelên azadîxwaz bernedane. Rahşan ji berxwedana Cizîrê ya 1992'an gelek bi bandor dibe. Ji televîzyonan qedexeyên pîrozbahiyên Newrozê dibihîze û roja piştî Newrozê zû radibe û li ser karton dinivîse 'Ez xwe li Kadîfekaleyê dikim Newroz, divê ez bersiva Cizîr, Nisêbînê bidim. Xwedî li min derkevin. Ez agahî didim Îsmet Sezgîn wê Newroz bê pîrozkirin. Lastîk tune be em ê bi canê xwe pîroz bikin!' Rahşan di 17 saliya xwe de bi agirê bedena xwe bersiva dewletê da.

**Li Ewropayê du jinên kurd**

Du jinên ku wateya berxwedanê li cejna Newrozê zêde kirin jî Bedriye Yildiz bi navê xwe yê tê nasîn Ronahî û Nîlgun Yildirim ango Bêrîvan in. Ew sala 1994'an li bajarê Almanya Mannheîmê canê xwe feda kirin. Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ev çalakî wek çalakiya azadiyê bi nav kir û got: "Ger azadî tiştekî hêsan bûya wê Ronahî û Bêrîvanê bedena xwe nedana ber agir."

**Bû pireke ji agir**

Yek ji serhildêrên ku bi çalakiya xwe dîrok nivîsand Sema Yuce ye. Ew di çalakiya xwe ya 21'ê Adara 1998'an de ku li girtîgeha Çanakkaleyê pêk anî û di 17'ê hezîrana 1998'an de tev li karwanê nemiran bû. Sema di nameya ku nivîsand de çalakiya xwe bi van gotinan vegot: "Ez dixwazim mêjî, dil û bedena xwe ji 8'ê Adarê heta 21'ê Adarê bikim pira ji agir. Ez dixwazim wek Zekiyeyê bişewitim, wek Rahşanê bibim Newroz."



**Sembola Botanê**

Ger em qala sembolên serhildanê dikin divê Binevş Agalê jî bi bîr bînin. Binevş Agal ango Bêrîvan sala 1996'an li Bişêriya Êlihê bû sembola berxwedanê. Jina êzidî navê xwe ji destana kurdan a 'Cembeliyê Mîrê Hekkarî û Binevşa Narîn' girt. Binevş Agal berê xwe dide çiyayan û li geliyê Bekayê demekê li cem rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan dimîne, piştre derbasî Botanê dibe. Li wir jinan birêxistin dike û dibe çavkaniya wan a hêviya rizgariya gel. 16'ê Çileya 1989'an de xaniyê ku lê dima hat îxbarkirin. Li ser vê êrîşê bi ser malê hat birîn û Bêrîvan heya guleya xwe ya dawî li ber xwe da. Binevş Agal li vê derê tev li karwanê nemiran bû, lê navê jina jîr heya roja me ya îro jî li Cizîra Botan tê bîranîn.

Dîroka Newrozê berxwedana jinên kurd radixe ber çavan. Wan jinan dîrok nivîsand û di roja me ya îro de jî ruhê wan di her tim dijî. Îsal çalakiyên 8'ê Adarê li her dera cîhanê bi pêşengiya jinan hat pîrozkirin. Jinan di çalakiyên xwe de peyama berxwedanê dan û ji bo mafên xwe yên bingehîn daketin meydanan. Vî ruhê berxwedanê jinan li qadên cejnê da jiyîn. Îsal qêrînên jinan ji bo azadiya Ocalan li qadan bilind bûn. Bi îdiayên der barê tenduristiya Ocalan de hatin kirin, di nav hefteya beriya Newrozê de li her derê peyama 'Rêber Apo xeta me ya sor e' hat dayîn û cejna Newrozê bi ruhê berxwedana li dijî tecrîdê hat pîrozkirin. Newroza sala 2021'ê bû Newroza li dijî tecrîda li ser rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan. Xuya dibe ku mîrateya pêşengên Newrozê bingeha berxwedanê xurt kir û ew bûn wesîleya domandina berxwedana li dijî dehaqên zalim. Cejna bihar, agir û berxwedanê, cejna Newrozê li gelên berxwedêr pîroz be!

## Jina enternasyonalîst

Di dîroka jinên leheng de jina ciwan a yewnanî Elefterîa Fortulakî jî divê bê bîranîn. Elefterîa di 23 saliya xwe 24'e adara 2004'an Kurdistanê weke welatê xwe pejirand û di nameya xwe de got: "Ez gelek ji yewnanî hez dikim. Lê ez bi qasî zimanê xwe ji kurdî jî hez dikim. Gelê kurd ji bo biratiya gelan têdikoşe. Ez jî wek Zekiye Alkan, Rahşan, Ronahî, Bêrîvan û Sema Yuce îsal Newrozê pîroz dikim lê hinek dereng mam." Vê rojê Elefterya jî li ser mîrateya jinan bedena xwe da ber agir û got biryarbûna wan gelê kurd xurtir kiriye.



Mizgîn Ronak

# Newroz hat bi awirên xwe yên Medyayî!

Berê dema ku dewleta tirk û hevkarên wê kurd nas nedikirin, mînak dema ku di pêşbaziyan de Dêrûl Zehferan dihat pirsîn digotin; "Li Artvînê ye" li zora min diçû lê niha li xweşa min diçe û dibêm; "Eynî wiha! Nizanibin! Lew ev der ne welatê we ye, hezar sal jî derbas bibin, hûn ê xerîb û nezan bin li ser vê axê, vî welatê."

Îja niha mesele befr e. Heta li Stenbolê befir nebare zivistan nayê û befir "ewqas nabe befir" qedirbilind nabe, nayê pîrozkirin lê welatê Celadet û Zerîfeyan zûde di bin befrê de ye, spîtahiya tevî gerdûnê li xwe pêçaye. Îja ev jî li xweşa min diçe, dibêm; "Rast e, befra we, zivistana we nû tê! A welatê çiyayan ne ya we ye!"

Lê niha mijar Newroz e û awirên Newrozîn! Dixwazim îsal Newrozê bi awirên Newrozîn ên ji hezaran salan berê pîroz bikim. Çawa! Mixabin em nikarin (an jî em hêj nikarin) xwe wek gulokek berfrê bigindirînin û biçin ba Kawayên Hesinkar û jinên li wê heyamê (her çiqas dîroka fermî qet behsa jinan neke jî di her heyamê de jin hebûne ku nebûna dê Kawayê Hesinkar jî çênebûya ne jî mezin bûbûya) lê em nikarin bi awirên wan ên Newrozîn ku bûne agirê azadiyê dîroka berî Hz. Îsa 640'î hîs bikin an jî xeyal bikin. Mînak; niha Kawayê Hesinkar û gelê xwe li ser bircên ku êdî ne yên zordestiyê ne, digel agirê geş li me mêze dikin. Em çawa dixwiyên? Ji wir û vir çawa diweze vejen (enerjî) çavên me çi dibêjin ji wan re? Rûyê me, dengê me, dilê me, meşa me, zimanê me?

Tiştên ku guherîne çi ne, yên mane çi ne. Yan jî çi ji me çûye, çi maye? Wekî gelek; welatek, yeko yeko kurdek em çiqas Newrozîn in êdî, çiqas belengaz, biyan asîmîlebûyî û dûrhez. Ferqa di navbeyan Dehaqên niha û yên hingê de çi ne? Wan çawa xwe rizgar kir, em çima hê jî nikarin dawî li her cureyên Dehaqan bînin û bibin Newroz! Jixwe wayê Mazlûm, Zekiye û Ronahî li wir in lew wan xwe gihand wê heyamê jî. Mifteya demê agir bû, wan ew mifte ji canê xwe çêkir û hem deriyê pêşerojê hem jî yê paşerojê ji xwe re vekir.

Agir jî li me dinêre niha, li wir her tişt agir e her agir bi çav û awir e! Em wekî kulîlkên li nav kavilan, serikên xwe bilind dikin carna gelo hûn me çawa dibînin ey awirên li 640'î? Em kî ne, dişibin we yan na? Hûn me wekî pêşerojek layiqê xwe dibînin an na?

Vê heyamê dagirkeriya bi hezar cureyî, vê Asûra dirinde dike borebor helbet û deng diçe Kawayan, Mazlûm, Zekiye û Ronahiyan. Em wekî çivîkên şermende difirin gurmegurma dilê me ye ji şerman. Xwezî ne wiha bûya. Xwezî qet ne wiha bûya! Awirên me jî her tiştên me jî Newrozîn bûna em welê çar –pênc, an jî sed parçe nebûna. Welatek bi agirşûştû, azadî yek ku li xeml û rewşa me dihat bûya.

Li me dinihêrin, ji serî heta binî, ji dil heta mêjî. Awirên me şikestî ne gelo yan behozî? Xeyalên me kedîkirî, rastiyên me hêsîrbûyî ne yan na? Kelecan, hêvî û serfiraziya Medyaya azad çiqas heye bi me re çiqas nîn e?

Newroz hat. Bi awirên xwe yên Medyayî li tevî malan digere, li tevî kolan û bajaran çirûskek datîne dilê me, kurdîtiyek ronî û dilşad...

Gotinek me dibêje "sal bi sal xwezî bi par" em bêjin Newroz bi Newroz, xwezî bi îsal? Em ê karibin bêjin? Lew baş bijîn jî nejîn jî Newroz, cil û bergên me yê yekane, rajena me ya jiyanî ye. Ger em ji Medyayê ve Newrozîn bixwiyên dê agir îsal helbestan bixwîne di guhên me tevan de.

Ka em destên xwe bihejînin ji wan re û bi serê xwe yê berz, azadiya xwe bigihînin heta ba wan. Jixwe digel strana "Newroz tê, li sûka Mahabadê" Qadî jî awirên xwe digihîjîne me. Em dibêjin "Newroz agir be ey Qadî! Werîsê berxwedana te bû qolye li stûyê me, em ê bi vê qolyeyê wiha li asîmanê serxwebûnê bihejin, heta bi hetayê." Newroz Pîroz be!



# Daxwaz hevdîtina rûbirû ye

Navenda Nûçeyan

**Piştî belavkirina îdiayên li ser medyaya civakî yên der barê rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de parêzer, saziyên civakî, partiyên siyasî bangewazî ji rayedarên dewletê kirin ku bi Ocalan re hevdîtineke rûbirû pêk bînin**

Ji sala 1999'an vir ve li Îmaraliyê li dijî rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tecrîdeke dijwar tê meşandin û herî dawî li ser medyaya civakî hinek îdia hatin kirin.

Buroya Hiqûqê ya Asrinê, têkildarî îdiayên der barê rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de daxuyanî da û bang li rayedarên dewletê hat kirin ku îdia dibin sedema fikaran û ji bo fikar ji holê rabin divê deriyê Îmraliyê li kontrolê vekin û bi Ocalan re peywendî were danîn û serdana hevdîtinê were qebûlkirin.

Parêzeran wiha got: "Demeke dirêj e ku em nikarin muwekîlên xwe yên li Îmraliyê bibînin, lewma her îdiaya ku têkildarî wan tê kirin em bi cidiyeteke mezin lê dikolin û hewldanên pêwîst di vê der barê de dikin. Ev îdiayên ku dem bi dem tên kirin, em nizanin ji kîjan çavkaniyê tên, lê belê ji bo me ya girîng ew e ku ev îdia bi rengekî bi rêk û pêk têkildarî birêz Ocalan tên kirin. Bêguman sedema herî girîng a vê rewşê ew e ku li Îmraliyê tecrîdeke dijwar heye û hemû derfetên me yên agahîstandinê hatine birîn."

**Serlêdan hatin redkirin**

Li ser rewşa tecrîdê û der barê fikaran de birayê Abdullah Ocalan Mehmet Ocalan û wasiyê wî Mazlûm Dînç û girtiyen din ên li Îmraliyê jî bi rêya parêzerên xwe cara sêyemîn serî li Dozgeriya Komarê ya Bûrsayê dan. Hemû serlêdanên berê hatibûn redkirin.

Kurdên ku li dîasporayê dijîn ji bo zelalkirina îdiayên ku der barê jiyana Ocalan de hatibûn kirin derketin qadan. Kurdistaniyan bang li CPT'ê kir ku bila wezîfeya xwe bi cih bîne. Kurdistaniyan destnîşan kir ku pir bi fikar û bi hêrs in.

**Ji saziyên civakî daxuyanî**

Koordînasyona Saziyên Demokratîk têkildarî mijarê li Stenbolê daxuyanî da û xwest demildest bi Ocalan re hevdîtin were kirin. Her wiha parlamenterê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan serî li wezareta dadê da û xwest ku fikarên wan ji holê bên rakirin. Parêzerên Ocalan ji bo bi muwekîlê xwe re hevdîtinê pêk bînin serî li serdozgeriyê dan, daxwaza parêzeran nehat bersivandin û parêzeran careke din serî lê dan.

Saziyên civakî li Amed, Stenbol û Îzmîrê daxuyanî dan û xwestin demildest bi Ocalan re hevdîtin were kirin. Endamên MED TUHAD-FED û TÛAY-DER'ê bang li hikûmetê kir ku tecrîda ser rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan bi dawî bibe û CPT û NY vexwandin ku peywîra xwe bi cih bînin.

Li avahiya HDP'ê ya Stenbolê jî ANYAKAY-DER, HDK, TJA, MATUAY-DER, DAD, DBP, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê daxuyanî dan û gotin ku der barê mijarê de daxuyaniyên rayedarên dewletê têrker nabînin û divê demildest bi Ocalan re hevdîtin were kirin.

Serokê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) Ozturk Turkdogan têkildarî îdiayên li ser tenduristî û jiyana Abdullah Ocalan axivî û diyar kir ku daxuyaniya dozgeriyê bi tu awayî têrê nake ku em ji ewlehî û tenduristiya Abdullah Ocalan gumanan nekin û divê pê re hevdîtin bê kirin.

Turkdogan bal kişand ser çûyîna Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) û Saziya Mafên Mirovan û Wekheviyê ya Tirkiyeyê (TÎHEK) û wiha got: "Ev sazî bêyî ku agahî bidin xwediyê wê rayeyê ne ku bi rehetî dikarin biçin Îmraliyê. Madem ev raye hene çima nayên bikaranîn? Ev rewş li derveyî qanûnê ye û divê li dijî vê rewşê bê derketin."

# Darbeya siyasî û êrîş zêde dibin

Ev demek e dirêj e HDP bi êrîşê dijwar re rûbirû dimîne û heta niha bi hezaran endam û rêveberên partiyê hatin binçavkirin û girtin. Dest danîn ser bi dehan şaredariyan, hevserokên giştî yên berê jî di nav de gelek parlamenter hatin girtin û parlamenteriya Leyla Guven û Mûsa Farîsogullari hat betalkirin û herî dawî jî parlamenteriya Omer Farûk Gergerlîoglu hat betalkirin.

Şerê taybet ku li hemberî HDP'ê hatiye destpêkirin gihîşt merhaleyeke nû û vê carê jî doza girtina partiyê ji HDP'ê re hat vekirin. Serdozgerê Komarê yê Dadgeha Bilind Bekîr Şahîn, ji bo HDP bê girtin serî li Dadgeha Destûra Bingehîn da.

**HDP: Ev darbeyeke nû ye**

Piştî ku doza girtinê hat ragihandin, hevserokên HDP'ê Pervîn Buldan û Mîthat Sancar demildest bertek nîşanî biryarê dan û gotin ku ev darbeyeke nû ye û dê berxwedana xwe ya demokratîk bidomînin û li hemberî zextan serî natewînin.

Balkêş e îdianameya girtinê ku hêj negihiştiye HDP'ê ji aliyê Ajansa Anadoluyê ve hat weşandin û tê gotin ku der barê 600 kesî de biryara qedexeya siyasetê were dayîn. Piştî ku îdianame aşkera bû derket holê ku der barê 687 HDP'iyan de dê biryara qedeya siyasetê were dayîn. Li gorî xala 69'emîn ya Dadgeha Dadgeha Bingehîn li şûna ji binî ve girtinê dibe ku alîkariya aborî were birîn û an jî cezayên cuda bên birîn.

Piştî ku biryara girtinê hat ragihandin li gelek kesan li ser medyaya civakî piştgirî da HDP'ê û bertekên tund nîşanî AKP'ê dan. Parlamenter, siyasetmedar, rewşenbîr, rojnameger jî di nav de gelek kesan nêrînên xwe parve kirin.

Her wiha gelek siyasetmedaran bi daxuyaniyan bertek nîşanî doza girtina HDP'ê da. Xebata Tifaqa Kurdistanî li Amedê têkildarî mijarê bi daxuyaniyekê ber nîşanî biryarê da.

**Li meclisê Nobeda Demokrasiyê**

Dadgeha Bilind cezayê der barê parlamenterê HDP'ê yê Kocaeliyê Omer Farûk Gergerlîoglu de erê kiribû. Biryara vê cezakirinê li Desteya Giştî ya Meclisa Tirkiyeyê hat xwendin. Bi vî awayî parlamenteriya Gergerlîoglu hat betalkirin. Di kêliya biryar dihat xwendin de Gergerlîoglû jî li Desteya Giştî ya Meclisê bû.

Beriya ku biryar li meclisê were xwendin Gergerlîoglû gotibû dê meclisê terk neke û piştî ku biryar hat xwendin Gergerlîoglu da zanîn ku biryar siyasî ye. Gergerlîoglu destnîşan kir ku ji aliyê gel ve hatiye hilbijartin û di vê bêhiqûqiyê de serokatiya meclisê wek amûr hatiye bikaranîn û wiha got: "Ez vê biryarê nas nakim. Ez ê peywira ku gel daye min heta dawiyê bi cih bînim. Ez ê nehêlim rûmeta gel were binpêkirin. Li Lijneya Giştî ya Meclisê berxwedana xwe didomînim. Heta Dadgeha Makeqanûnê biryareke hiqûqî bide dê dewam bike."





Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# 'Bijî biratiya gelan'


Piştî betalkirina wekîltiya Omer Faruk Gergerlîoglû ji hêla meclisa Tirkiyeyê ve parlamenterên HDP'ê bi dirûşma "bijî biratiya gelan" berteka xwe li hemberî vê biryarê nîşan dan. Her çiqas gotina "bijî biratiya gelan" li dijî faşîzmê helwesteke piştgiriyê bide xuyakirin jî di naveroka xwe de ji pirsgirêkan azade nîn e. Beramberî hemû rêzdarî û hurmeta li hemberî helwesta birêz Gergerlîoglu, dê baş bibe, ger mirov li ser têkiliya yekser a di navbera gotin û wateyên wan ên dîrokî, civakî, siyasî û exlaqî de bisekine.

Pirî caran mirov çavkaniya gotinên ku di nav gel de wek dirûşm tên berzikirin, nikare bişopîne. Bêguman ev yek ji pêvajo û buyerên dîrokî ne cihê ye. Her wiha bi rastiya civaka xwe ve girêdayî ne. Wek temsîl ji devekî, ji rêxistinekê yan jî komekê derdikevin, di nav girseyan de belav dibin û li gorî giraniya têkîldarî, pejirandin û adêxwe-dîtinê de facto tên pejirandin. Bi taybetî di kurdî de dirusmên wek "jin, jiyan, azadî", "berxwedan jiyan e" gotinên bi vî rengî ne û di heman demê de temsîla tevgerên xwe yên civakî dikin. Bi taybetî gotina "jin, jiyan, azadî" kurd ne kurd, di devê her kesên ku tev li vê dirûşmê dibin de ye û wateya wê di vê çarçovê tê zanîn. Her wiha peyva "Rojava" ev deh salên dawî bêyî hewcedariya wergerê bûye peyveke transneteweyî û ji xeynî wateya xwe ya peyvî, xwedî wateyeke polîtîk û civakî ye. Di heman demê de bîrdoziyeke temsîl dike. Di mînakên cîhanî de jî peyvên wek "nî una menos" an jî "we are the 99 percent" tevger û kampanyayên bêsînor û bîrdozî destnîşan dikin. Ev diruşm xwedî nasname ne, di naveroka xwe de hem helwesta xwe, him jî hemberbûna xwe diyar dikin.

Em werin ser gotina "bijî biratiya gelan". Peyva 'birayetî' bingeha xwe ji felsefeya Stoa û ola cihutiyê digire. Her wiha ola xiristiyaniyê ji vê kevneşopiyê bandor dibe û peyva biratiyê girêdayî têkiliya xwe ya bi bav û bavikşalariyê tê bikaranîn. Lê wateya wê ya girêdayî diruşma "bijî biratiya gelan" dîrokeke nêztir nîşanî me dide. Tê zanîn yek ji diruşmên bingehîn a Şoreşa fransî 'birayetî' (Fraternité) bû. Dûre tevgera karkeran ji dêvla peyva 'birayetî' peyva 'piştgirî'yê, bi mebesta ku li dijî faşîzmê, mêtingerî û bindestiyê hevkariyeke ji sînorên welatan wêdetir pewîst e, bi kar anî. Êdî diruşma "bijî piştgiriya navneteweyî" bû sembola hevkariya gelan a li dijî faşîzm û bindestiyê. Li gorî bikaranîna peyvê li hin deveran jî 'birayetî' di wateya aşitî, xweşbînî û bi hev ve girêdanê tê bikaranîn. Heta Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî di gotara xwe ya yekemîn de vê peyvê bi kar tîne: "Hemû mirov azad û ji aliyê maf û rûmetan ve wekhev tên dinyayê. Xwedî hiş û wijdan in û divê bi hestên biratiyê nêzîkî hev bibin." Her wiha ev "danezan bingeha xwe ji danezana mafê mirovan û hemwelatiyan" a Şoreşa Fransî digire.

Tê zanîn Danezana Mafê Mirovan a Şoreşa Fransî bi gelek awayan hîn di dema îlankirina xwe de hat rexnekirin. Rexneya herî mezin ji hêla şoreşger, parêzvana mafê jinan û nivîskara bi navê Olympe de Gouges hat kirin. Şoreşgerên mêr nîvê civakê, ango jinan li derveyî mafê mirovan hiştibûn. Her wiha mafên kesên reşik, cihû û karker nedihatin bilêvkirin. Ev kom yekser ji daxuyaniya mafê mirovan bêpar mabûn. Ji ber ku mafê mirovan di çarçoveya netewedewletî û hemwelatiyê de hatibû formulekirin, tenê mêrên ewropî û spî ji van mafên mirovan sûdê werdigirtin. Li ser vê yekê Olympe de Gouges bi awayekî mafdar got, "Ev danezan ne mafê mirovan, lê mafê mêran diparêze." De Gouges du sal piştî danezana mafê mirovan di sala 1791'ê de li dijî serdestiya mêran "Danezana Mafê Jinan û Hemwelatiyên Jin" nivîsî. Hîn beriya nivîsa wê bê çapkirin li Fransayê desthilatdarî ket destê monarşiyê. Gotara yekemîn a danezanê wiha dibêje: "Jin azad tê ruyê dinyayê û bi mêran re xwedî heman mafî ye. Cudahiyên civakî tenê dikarin xwe bispêrin kêrhatîbûnê." Olympe de Gouges bi giştî di danezanê de wekheviya jin û mêran binxêz dike. Lê di paşgotina daxuyaniyê de balê dikişîne ser kevneşopiya mêtinger a Fransayê û rola bav, bira û kuran a di tunekirina xweza û qirkirina mirovên reşik, ên di bin mêtingeriya Fransayê de dijîn.

Şoreşa Fransî bêguman bi diruşmên xwe yên "azadî, wekhevî, û birati"yê temsîla kevneşopiyeke bingehîn dike. Lê wekî hemû bûyerên dîrokî ku ev bûyer jî bi berçavkeke zayendî bê lêkolînkirin, wêneyeke ku li derveyî zanîna me ye derdikeve holê. Li hêla din têkoşîna jinan a bi hezaran salan divê rê li guhertina hînbûnan jî veke. Olympe de Gouges ji ber helwesta xwe ya li dijî serdestiyê û ji ber têkoşîna xwe ya ji bo wekheviya jin û mêran bi giyotînê hat cezakirin. Hêja û layiqê tekoşîna wan a hezaran sal in ku mirov ji dêvla "bijî biratiya gelan" dirûşma "bijî xwişk û biratiya gelan" bi kar bîne.


EM Ê QADÊN NEWROZÊ
BI DAXWAZA AZADIYÊ BIXEMILÎNIN
NEWROZ PÎROZ BE
Newroz dîrokeke zindî ye; hatina biharê, coş û ahenga vejînê û raperîna li dijî zilm û zordariyê ye. Newroz berxwedana hezar salan a Kawayan e li dijî zilma Dehaqan. Newroz 3 pîçke ye, ku li zindanên Amedê pêketiye û îro bûye agir û pêt. Ruhê Newrozê îro li zindanan, li seranserî jiyanê zindî bûye û gihiştiye wateya xwe ya dîrokî. Newroz mîrasa berxwedana Semayan, qîrîna azadiyê ya jinan, xewna serkeftinê ya ciwanan e. Agirê Newrozê gelê Kurd û hemû gelên bindest ronî dike. Newroz xemla aştiyê, helwesta yekîtiyê, silava biharê û mizgîniya azadiyê ye. Werin em 21'ê Adarê li her derê agirê Newrozê gur û geş bikin. Em bi agirê Newrozê li ber xwe bidin, bi ser bikevin.
2021
NEWROZ
PÎROZ BE
HDP

# Wêjeya bêxwedî ya kurdên Sovyetê!





Yaşar Eroglu

Di sala 2016'an de min der barê serboriya transkrîpsiyona berhemên kurdên Sovyetê de gotarek şandibû kovara Wêje û Rexneyê. Rêvebiriya kovarê biryara weşandinê ji min re ragihand lê di pişperdeya wê de çi qewimî, hesabên çawa hebûn nizanim, nehate weşandi. Pê re jî deng û sewta wê derneket, îro jî kovar nayê weşandin.

Kanaleke kurdî ya li ser youtubeyê bi zindî weşanê dike, bi pêşkêşiya Têmûrê Xelîl mijara li jor jî tê de bi rêvebirê weşanên Lîsê Lal Laleş re hevpeyvînek kiriye. Vê hevpeyvînê anî bîra min û li min ferz kir ku careke din dest bavêjim heman mijarê.

Kurdên Sovyetê bi sedan berhemên hêja bi alfabeya krîlî berhilandine. Di bin van berheman de îmzeya navên gelek nivîskar, akademîsyen û wêjenasên bi nav û deng weke Qanatê Kurdo, Erebê Şemo, Casimê Celîl, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ferîkê Ûsiv, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl û hwd hene.

Gelek weşanxaneyên bakurê Kurdistanê ji bo tevî literatûra kurdî ya giştî bikin ev berhem latînîze kirine û gihandine ber destên me. Lê hinek weşanxaneyên weke Lîs û Perî mudaxeleyî berheman kirine, awayê neresen li wan ferz kirine û ew guherandine.

Edîtorê weşanxaneya Lîsê Kawa Nemir di pêşgotina Hewariyê de wiha dibêje, "*Çapbûna Hewariyê bi boneya 100 saliya jidayikbûna Heciyê Cindî dê me kurdan hebekî din nêzîkî hev bike, em bêtir dibînin bê di kelepûra me de çi heye çi tune. Û ji bo ku ev rastî bikaribe pêk bê, me di edîsyona vê berhemê de gelekî bala xwe kurdiya ku ji binî ve bi devoka Serhedê û Kurdên Qafqasan bû. Me, bêyî ku taybetiyên hevoksaziya wê xera bikin,* ***kurdiya romanê, heya ku ji me hat, ber bi kurdiya hemû kurdan anî,*** *ku wekî pêvajoyo xweyekgirtîkirinê her li peydabûnê ye.*" Bibînin ku ev nêrîn seranser bi problem in.

Di pêşgotina Şer Li Çîya-Şêx Zayîr ya Eliyê Evdirehman de Hêjarê Şamîl û Ehmed Onal mudaxeleya xwe wiha tînin zimên, "*Dema ku me ev berhem ji krîlî wergerand alfabeya latînî orîjînalîteya wê parast. Lê me ji aliyê termînolojiyê ve ew peyvên ku îro li Kurdistanê bi cih nebûne bi kar neanîn û me peyvên kurdî yên ku îro li bakurê Kurdistanê bi kar tên bi kar anîn û me hinek guhertin li ser kitêbê kirin. Me peyvên ku ji zimanê rûsî, ermenî û azerî hatine girtin* ***li gor kurdiya îroyîn guherandin****.*" Bi çi û kîjan mafî?

*'Kurdiya hemû kurdan', 'kurdiya îroyîn'* balkêş e, hincet dişibine hev. Divê bê pirsîn ku ev mudaxeleya ku ew bixwe jî tesdîq dikin, nabe xirakirina 'taybetiyên hevoksazî' û 'orîjînalîte'ya berheman? Gelo ku metna pirtûkê seranser bê biguhertin hingê 'orîjînalîte' xira dibe?

Qadeke beyar û bêxwedî dîtine li gorî perspektîfên teng lê mudaxele dikin. Ji ber ku bixwe gotine, ji bo îspata wê hewce namîne lê bi çend mînakan em nîşandin ku tehrîfat û mudaxele çawa pêk anîne. Weşanxaneya Periyê maf ji bo xwe dîtiye ku qertafa pirjimariyê *'êd'* ku li Bakur weke *'ên'* tê bikaranîn guherandiye. Gelek mînakên wiha hene, 'agahiyê*d* stendî' guherandine s*er* 'agahiyê*n* stendî', 'nobedarêd wan' guherandine 'nobedar*ên* wan'.

Weşanxaneya Periyê di romana *Şer Li Çîyan- Şêx Zayîr* de li gorî rastiya xwe qulibandine peyvên weke, 'Xevetçî: *kedkar, xebatkar*; beledçî: *rênas*; zevtçî: *dagirker*; temaşeçî: *temaşevan*; hûrmetlî: *rêzdar, birûmet*; qîmetlî: *bi qîmet*.' Hinekên din jî wiha ne; ecnebîbîyanî, xusûsiyet- *taybetmendî*, rûşet-*bertîl* ( r. 37), cab- *bersîv* (r. 43), nebelî- *nedîyar*, qe-*hîç* (r. 44), mekteb-*dibistan* (r. 45), zehmet- *dijwar*, hurmet- *rêz* (r. 48), xeberdan- *axaftin* (r. 51), gule- *berîk* (r. 52), cinet- *bihuşt*, lazim- *divê* (r. 57). Ev peyvan tehma 'orîjînalîte'ya wêjeya kurdên Sovyetê ye ku ew nebin berhem ji aîdiyeta nivîskarê xwe tê şûştin.

Her wisa di romana Heciyê Cindî *Hewariyê* ya weşanxaneya Lîsê de jî em vê yekê dibînin. Peyvên weke; *silav û kilav* (r. 46), *êxist* (r. 63), *lêzim* (r. 60), *zarok* (r. 49), *hevsir* (r. 46), *tehmijîn* (r. 72), *vebijirîn* (r. 73), *mirov* (r. 196), *civiyan* (r. 197), *parêzkar* (r. 197), *şîkayetdêr* (r. 265), *zagon* (r. 267), *bertîl* (r. 267), *defvan* (r. 268), *heyv* (r. 298), *amade* (r. 323) bi yên resen re guherandin. Gelo '*selam kelam*' bi reseniya xwe bima, nebûya '*silav û kilav*' wê ji romanê çi kêm bûya? Berevajî mebesta diyarkirî zimanê ku hatiye guherandin roman giran kiriye. Reseniya peyvê *'xwera xwera'* ye, ev qalib wek *'ji xwe re ji xwe re'* hatiye guhertin. Meraqa mirov bilind dibe; gelo ji bo ku roman '*ber bi kurdiya hemû kurdan*' bê, weşanxaneya Lîs kîjan standart weke pîvan girtine? Gelo bi rastî *'kurdiyeke me hemû kurdan*' a weşanxane behs dike heye? Ev destnîşankirin rast e yan mubalexe ye? Ka em binêrin weşanxaneyê bixwe ev yek çawa pêk aniye?

Di zimanê nivîskî de '*qe*' tune ye, wek '*qet*' tê nivîsandin. Lê weşanxaneyê hem yekgirtin parastiye hem jî '*qe*' weke '*qet*' neguheraniye. '*Zabitê kinik î hupiz î serçav terikî em birin otaxeke biçûk î qilêr...*' Awayê '*kinik î hupiz î serçav terikî*', '*biçûk î qilêr*' êdî di zimanê nivîskî yê '*kurdiya hemû kurdan*' de gelek kêm tê bikaranîn. Divê di '*kurdiya hemû kurdan*' de wiha bihata bikaranîn: '*kinik ê hupiz ê serçav terikî*', '*biçûk a qilêr*'.

Peyvên weke, '*xêncî*' çima nekirine '*ji xeynî*' yan jî '*xeyn ji*', ji '*demekî*' re (bi eslê xwe tirkî ye) bergindek nedîtine gelo? Gelek peyvên wiha di romanê de dest lê nedane. Di vir de baş dixuyê ku qaydeyên weşangeriyê na, rastiya di serê weşangeran de û 'azadî!' û teserûfa wan derketiye pêş.

Lal Laleş di hevpeyvînê de ku bi Têmûrê Xelîl re kiriye wiha dibêje, "*Meseleya Şivanê Kurmanca ya ji me re jî tiştekî balkêş û weke suprîzekê çêbû. Ji ber ku bi salan çi nivîskar çi jî xwendevanên jîr ên li welêt em bêjin pirtûka Erebê Şemo bi navê Şivanê Kurd dizanibûn …, ev zimanê ku em dixwînin yê Erebê Şemo ye. Wek ku hûn jî dizanin her nivîskar bi vegotina xwe, bi stratejiya vegotina xwe, bi hevoksaziya xwe, bi cumleyên xwe hostetiya xwe derdixe holê û bi mirov re dide şîrînkirin. … ya ku me xwendibû dîse bi lugata nivîskarekî hêja yê kurd Nureddîn Zaza bû. Bêguman ew jî zimanekî xweş e lê ne ya Ereb Şemo bû. Me jî digot qey ya Ereb Şemo ye. Mistefa (Aydogan) bi awayê berfireh û hûrgilî ev çîroka… wê pêvajoya û berhem çawa amade kiriye, di ku de hin sererastkirin, hinek tîpên ji ber rewşa çapxaneyê kêm hatibûn lêxistin, rastkirina wan bigiri heta yanî bi rast jî serê xwe pê re pir êşand.*" Yanî bi vê hesasiyetê û kedê ji bo çap û weşanê amade kir. Ew keda çiqas bê pesnandin jî hêja ye.

Lê kak Lal Laleş çi kiriye? Berevajî van nirxandinên xwe, li dewsa ku ji xeynî serastkirinên teknîkî ku mecbûriyeta lêanînê heye, dest neda reseniya berhemê/an. Lê ji bo ku berê wê bide '*ber bi kurdiya hemû kurdan*' berhem di bin moderatoriya wî de hatiye tefîlkirin.

Ez meraq dikim, heye ku weşanxaneya Lîsê mudaxeleyî berhemên Şener Ozmen ên devokî kiribe yan jî weşanxaneya Perî mudaxeleyeke wiha li berhehemên nivîskarên bakurî kiribe? Ez pê ne bawer im. Kurdên Kafkasyayê dengê xwe nikarin ji çemê Erezê virdetir ragihînin, gelekên wan jî mirine. Eger peyrewên mîrata wan destûreke wiha dabûne wan, mafê wan jî tune ye, ji ber ku berhem tenê ya nivîskarê wê ye; çi be ew e, resen e, kes nikare kêm û zêde bike. Hingê em ê bi tehm û çêja zimanekî xerîbê berhemên wan bixwînin weke Laleş gotiye. Çawa ku hinek mudaxeleyî reseniya peykerê Rafael an Mem û Zîna Ehmedê Xanî bikin. Bi salan e hê jî nîqaşa tenê peyvekê tê kirin ku 'bi' ye yan 'bê' ye ya di malikeke Mem û Zînê de.

Nivîskar fêkiyê wê çandê ye ku ew jî jê hatiye. Hema bêjin mebesta seranser nivîskarê kurdên wî aliyê çemê Erezê ango Kafkasyayê baş tê xuya ku kit bi kit dixwazin çanda heyî bi qeyda nivîsê, deng, belge hwd nemir bikin. Eger hûn mudaxeleyeke bi vî rengî bikin ew fekî êdî nabe ya wî baxçeyî, hebe tune be dibe fekiyekî 'aşî'kirî. Yanî êdî Hewarî ne ya Heciyê Cindî ye, Şer Li Çiya jî ne ya Eliyê Evdirehman e, êdî xwediyê wan ên nû hene; Lîs û Perî, Kawa Nemir û Ehmed Onal.

A heyirî dihelê ev e; beyî ku vê şaşiyê rexne bikin ji kurdên Sovyetê Hêjarê Şamîl û Têmûrê Xelîl tevî vê kiryara şaş bûne.

Kurdên Sovyetê ango Kafkasyayê ji gencîneya kurdî re gelek berhemên weke zêr û zîv hiştine. Weşangerên kurdên Bakur divê bi feraseta 'Kek'tiyê nêzî wan nebin, jixwe ne kekê wan in, divê reseniya wan biparêzin û wisa derbasî aliyê me bikin. Karê dikin ji bilî mijara van rexneyan karekî bêhempa û hêja ye. Lê divê tefîl û heram nekin.

# Nivîsandin û çend pirs

Konê Reş

Ezbenî! Her çiqas nivîskarî ji der ve hêsan xuya be, lê bi rastî ew wiha jî zehmet û zor e. Eger nexwîne û nenivîse, nexweş dikeve! Kesê ku karê nivîskariyê bike û bixwaze di nivîskariya xwe de berdewam be, divê bi şev û rojê bi peyvan re şer bike! Dinya li serê wî dibe wek tara bêjingê û hundirê serê wî dibe wek qada şer. Ku şer neke, nivîskarekî miriye!

Erê ezbenî! Tu kes wek nivîskar ji dayika xwe re çênebûye. Încex mirov bi xebata salan dibe nivîskar. Ji bo hînbûna pîş û sazekî neh-deh sal dem ji mirovekî re divên, ji ber ku nivîskarî ji gelek pîş û sazan zortir û zehmetir e. Ango neh-deh sal ji bo hilgirtina navê nivîskariyê ne gelek in. Yê ku navê nivîskariyê hilgire, divê salên dirêj bide ber çavên xwe. Nivîskarî karekî çetin û dijwar e. Astengiyên wê pir in. Lê çendî zehmetiyên wê hebin jî, ewqasî xweş û pîroz e.

Sebaretî me kurdan, eger em kurd bin û doza me Kurdistan be, zimanê me kurdî ye, ne tirkî, erebî û farisî ye. Pêdiviya me bi nivîskar û xwînerên zimanê me heye. Nivîskar û xwînerên zimanê kurdî bingehên herî girîng in ji avakirina welatê re. Ma em ji kê re dinivîsin ku xwîner zimanê me nebin û ku em bi tirkî, erebî û farisî binivîsin, welatê ku em doza wî dikin li ku dimîne? Ma em zimanê xwe yê şîrîn, pêmayên xwe yê zengîn û zargotina xwe ya dêrîn di ser guhan re bavêjin? Çîroka Memê Alan û Siyabend û Xecê ji milk û malê kê bihesibînin? Gotinên Cizîrî, Xanî, Nalî û Koyî û Cegerxwîn bişewitînin?!!! Ezbenî! Em dijîn da ku bi nasnameya xwe mezin bibin û nasnameya ziman, ax û dîrok e.

Ji min pirsîn: Torevan kî ye? Min got: Torevanî danak ji xwedê ye. Mirovê torevan ew e yê ku serpêhatiya xwe wek a min û a te dinivîse. Bi rengekî din: Ew nivîskarê ku ez xwe di nivîsên wî de dibînim.

Ji min pirsîn: Cudahiya di navbera helbesta nûjen û kilasîk de çi ye? Min li wan vegerand: Helbesta nûjen mikurbûn e... Helbesta klasîk rêzkirin û lihevhatina gotinan e.

Ji min pirsîn: Tu ji bo kê dinivîsî? Min got: Ez ji bo wan kesên ku bi zimanê Cizîrî, Xanî û Mîr Bedirxan diaxifin, dinivîsim... Ji bo xelkên Qamişlo, Amed, Zaxo û Mehabadê dinivîsim. Ji bo lehengên ku xwîna xwe di ber azadiya welatê min de rijandine û dirijînin da ku careke din berfa spî li ser çiyayê Agirî, Cûdî, Barzan û Pîremegrûn, sor nebe, keç û xortên welatê min bi aştî û aramî bijîn û her yek ji wan li ser Memê xwe, Siyabendê xwe, Zîna xwe, Xeca xwe stranan bibêje... Edûla Zor Temir Paşayê Millî jî, bê tirs li ser Derwêşê Evdî binewhirîne... Erê, ez li dor gul û kulîlkên welatê xwe dinivîsim, ewên ku ji zimanê dayika min û te fêm dikin... ewên ku ez û wan bi yek şûrî dikevin û radibin... ewên ku ne ji wan be ez tune me... hebûna xwe di hebûna wan de dibînim. Min tu carî destûra nivîsandinê ji kesî nexwestiye, bi taybetî nivîsandina helbestê. Pêwistiya nivîsandina helbestê ne bi destûrxwestinê ye û ne jî bi demeke destnîşankirî ye.

Û min berdewam kir: Ez ê çawa wêneyê bav û kalên xwe winda bikim, kum û kolosê wan li ber ba bifelişînim?!! Çendî dayikên me gazinan bikin, çendî Mîr Bedirxan, Şêx Nehrî, Şêx Seîd û Barzanî ji me bi gazin lome bin; fêde nake... hê jî em di çayxaneyên bîranînan de qerebalixê dikin û bi demên dirêj li ber dergehên bajarên giryayî radiwestin! Lêborîn û pexşanê dixwazin û ji darên xûz û tewiyayî dipirsin; gelo, em bi derengî ketine?!

# Çimaya Newroza kurdan!

Delal Aydin

Wekî ku tê zanîn reh û rîşeyên Newrozê di serdemên antîk de veşartî ne. Her çiqas 21’ê Adarê çawa roja hatina biharê be were pîrozkirin jî ji aliyê naveroka xwe ya îranî ve xwe dispêre pergala ayînî ya zerdeştiyê. Bi misilmankirina axa Îranê re Newroz ji cewhera xwe hat dûrxistin û bi baweriya îslamê re hat guncandin. Îro jî li Îranê 21’ê Adarê wekî sersalê tê pejirandin. Her wiha di nav nexşeya Îrana Mezin de, li deverên ku kurd jî tê de, li Azerbeycan, Afganistan û Komarên Asyaya Navîn her sal Newroz tê pîrozkirin. Newroz li her çar parçeyên Kurdistanê di nav hemû rêxistinên kurdan de wekî cejna neteweyî ya hevpar tê qebûlkirin.

Em dikarin bibêjin ku Newroz di nav hemû rêxistinên kurdan de wekî mîta damezirîner hatiye cîbicîkirin û bêhtir li ser ‘çima tê pîrozkirin’ hatiye rawestandin. Em ê di vê nivîsê de bêhtir bal bikişînin ser wê yekê ku Newroz çawa bûye ya kurdan. Di vê çarçoveyê de em cara ewil di nav nimûneya kovara Jînê de rastî vê yekê tên ku ji bo netewesaziyê efsaneya Kawa hatiye bikaranîn. Kovara Jînê ji aliyê “Kurdistan Tealî Cemiyetî” ve di navbera salên 1918-1919’an de dihat derxistin. Li ser vê esasê efsaneya Kawa wekî mîteke ku kurdan ji gelên dîtir cuda dike, wekî vegêrana “rûdaneke neteweyî” dihat sazkirin.

Wekî ku em dizanin Kurd Tealî Cemiyetî negiha mirazê xwe û sazkariya der barê efsaneya Kawa û Newrozê de qut bû. Piştî gelek salan Îhsan Nurî Paşa dest avêt mijarê. Îhsan Nurî Paşayê ku fermandarê Serhildana Agiriyê bû, piştî têkçûna serhildanê derbasî Îranê bû û li wir pirtûka xwe ya bi navê Rehên Kurdan weşand. Di pirtûka xwe de bi helwesteke neteweperwer hewl dida hebûna kurdan îspat bike.

Îhsan Nurî dema li jêderkên neteweya kurd digeriya pêrgî efsaneya Kawa hat. Lê belê Îhsan Nurî roja ku efsaneya Kawa dê bê pîrozkirin li gorî roja “tolhildanê” destnîşan kiribû. Wisa dixuyê ku ji bo fermandarê serhildaneke têkçûyî Îhsan Nurî Paşa, cejnê wekî “tolhildan” binavkirin watedartir bûye.

Hewldanên avakirina mîtekê yên Îhsan Nurî deng veneda, lewra berhema wî di sala 1977’an de ji bo zimanê tirkî hat wergerandin. Di vê serdemê de rêxistinên kurdan ên li ser xeteke sosyalîst û dijkolonyal bûn, efsaneya Kawa li gorî teşeyeke tezetir ava kiribûn. Beriya her tiştî cejna Newrozê û efsaneya Kawa bûbûn tiştek. Jê wêdetir êdî “Kawa bi pêşmalka xwe ya ku kiribû direfş bûbû proleterê pêşeng ê gelê kurd ê bindest”. Her wiha kovara bi navê Kawa Kawayê Hesinkar wekî “Spartakûsê Kurdistanê” pênase kiribû.

Şoreşgeran piştî derbeya leşkerî ya 12’ê Îlona 1980’yî karibûn kelecaniya xwe ya Newrozê bi gel re parve bikin. Di dema darbeyê de wekî encamên îşkenceyên li girtîgeha Amedê, Mazlûm Dogan di 21’ê adarê de bi çalakiya fedayî dawî li jiyana xwe anî û bû sembola berxwedanê. Ji teref PKK’ê ve wekî “Kawayê Hemdem” hat îlankirin. Kawayê Hemdem ê ku di nav bêjara PKK’ê de cih digirt jî hejar bû lê ji “pêşengekî proleter” wêdetir wekî “lehengekî ku xwe ji bo kurdayetiya dihat tunekirin vejîne feda kiriye” dihat pênasekirin. Rojên Newrozê wekî rojên serhildana li dijî “TC’ya zalim” hatin qebûlkirin û Newroz wekî mîteke berxwedanê di navenda bêjara PKK’ê de cihê xwe girt. Ji ber vê yekê partiyê alaya xwe ya ku li ser stêrka sor das û çakûç hebû, di sala 1995’an de guherand û li ser stêrka sor pêtala (meşale) ku agirê Newrozê temsîl dikir bi cih kir.

Nemaze di salên 1990’î de çalakiyên ku rojên Newrozan dihatin kirin bû sedem ku tevgera kurdî berfirehtir bibe û bibe tevgereke girseyî. Ji aliyekî dîtir ve Newroz bû sedem ku pirsa kurdî û nîqaşên li ser tên kirin demildest bên biencamkirin.

Digel vê yekê peywirdarên dewletê pîrozkirina cejnê bi navê ‘Nevruz’ fermî kirin û di van pîrozbahiyan de dihat destnîşankirin ku Newroz di bingeha xwe de cejneke tirkan e û ev jî bû rehendeke îdeolojîk a dîtir ku rengê xwe da şer. Bi vî awayî Newroz bi temamî veguherî qadeke şerê îdeolojîk.

Dewletê ji bo vê nêzîkatiya xwe ya li ser Newrozê bide rûniştandin tenê tundiyê bi kar neanî, her wiha hewl da ku ev wekî çîrokeke alternatîf bê navxweyîkirin. Ji bo vê jî dewletê îdiayên hin nivîskaran esas digirt û Newroz wekî Cejna Ergenekonê ya Tirkan dihesiband. Lê gelek kesên di nav çapemeniya wan a sereke de cih digirtin jî tiranê xwe bi vê helwesta dewletê dikirin. Polîtîkaya Nevruzê ji bo veçirandin û aşkerakirina îdeolojiya serdest xaleke giring û balkêş bû. Çalakiyên Nevruzê yên ku dewlet mecbûr ma demildest wan pêk bîne, amûrên îdeolojîk ên dewletê jî yek bi yek îfşa dikir.

Wisa dixuyê ku ew kelecaniya rayedarên dewletê ya der barê pîrozkirina Nevruzê de îro çilmisiye. Lê beramberî vê li her deverên Kurdistan û Tirkiyeyê bi milyonan kurd Newrozê dipên û pîroz dikin. Her wiha êdî her kes pê dizane ku Newroz cejneke kurdan e.

Nevruza ku Cejna Ergenekonê ya Tirkan temsîl dike ji domandina zilmê wêdetir ne tu tişt e. Ligorî min ew tîpa “w”yê ya di Newrozê de vê tiştê radixe ber çavan.



# ‘Bi agirê Newrozê li ber xwe bidin, azad bibin’

Newroza sala 2020’an ji ber nexweşiya koronayê li Kurdistanê nehatibû pîrozkirin lê dîsa jî li taxên bajar û li ser banên malan, li gelek deverên Kurdistanê hatibû pîrozkirin. Li seranserê sala 2020’an, kurd li aliyekî li dijî şewba vîrûsa koronayê têkoşiyan, li aliyê din li her qadê li dijî pergalên zilimkar li ber xwe dan. Agirê Newroza 2021’ê bi ruhê berxwedana kurdan geş bû.

**Bi rojan pîrozbahî**

Li Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava bi ruhekî berxwedêr gelên kurd hêdî hêdî ber bi roja Newrozê ve amadekariyên xwe kirin. Li hin bajarên Rojava û Başûr pîrozbahiyên Newrozê dest pê kirin û ber bi roja 21’ê Adarê ve amadekarî bileztir bûn.


Li bakurê Kurdistanê Komîteya Amadekar a Newroza Amedê, berî mîtînga mezin a Cejna Newrozê, agirê Newrozê pêxist û starta pîrozbahiyên Newrozê da. Newroz îsal li bakurê Kurdistanê û bajarên Tirkiyeyê bi dirûşma ‘Bi agirê Newrozê li ber xwe bidin, azad bibin’ hat pîrozkirin. Bi rojan li kolanan agirê Newrozê hat pêxistin û ev coşa ku beriya hefteyan hatibû destpêkirin di roja Newrozê de derket asta herî jor.

**Agirê Newrozê geş bû**

Beriya roja Newrozê li aliyekî agirê Newrozê hatibû geşkirin û li aliyê din jî bi çalakiyên cihêreng gel ji bo pîrozbahiyên Newrozê hatibû vexwendin. Newroz di 21’ê Adarê de li 30 bajar û 61 navçeyan hat pîrozkirin.

Çawa ku bi salan e zilm û zordariyê, zext û çavtirsandinan nikaribûn pêşiya gelê kurd bigire ku Newroza xwe pîroz bike, belavbûna vê nexweşiya koronayê jî nikaribû pêşiya tîn û rîvîna agirê Newrozê di dilên serhildêr de bigire. Tevî metirsiyên nexweşiya pandemiyê ku hê jî belav dibe, bi milyonan kurd li her deverên Kurdistanê û li her deverên ku lê dijîn, Newroza xwe bi coş û biryardarî pîroz kirin.





Ramazan Olçen

## 2021 Newroza azadiyê ye

Beriya mîladê di sala 612'an de bi pêşengiya Kawayê Hesinkar li dijî Dehaq hat vêxistin. Ew agir tu carî venemirî û ev 2 hezar û 633 sal in her geş û gur dibe.

Gel û civakên qedîm ên vê axê wateyên cuda li Newrozê dikin. Lê ji bo qewmê çiyê ji bo kurdan Newroz vejîn e, raperîn e, serhildan û berxwedan e.

Gelê kurd par ji ber pandemiyê nekarî weke salên borî meydanên Newrozê tijî bike. Lê îsal heyfa par jî hilandin û li dora agirê Newrozê govenda azadiyê gerandin. Salên borî Newroz çawa hatibû pîrozkirin ka em bi hev re hafizaya xwe teze bikin.

Gelê kurd ji salên 90'î heya niha tevî hemû astengî û qedexeyan bi coşeke mezin Newrozê pîroz dike. Newrozên ku ji salên 90'î heya niha hatine pîrozkirin, bi coş û rengîniya xwe di bîra mirovan de mane.

Cara ewil di sala 1991'ê de Newroz bi awayekî girseyî li Nisêbîn, Cizîr, Amed, Stenbol, Edene, Bismil, Kerboran, Pirsûs, Pasûr û Hênê hat pîrozkirin.

Bi hezaran kesên ku paxav bi qedexeyên dewletê nekirin, derabeyên dikanên xwe danîn û dibistan boykot kirin û daketin qadan. Wê demê dewletê êrişî Newroza Nisêbînê kir û 31 kes qetil kirin.

Newroza 92'yan li gel astengên OHAL'ê jî bi girseyî hat pîrozkirin. Di êrişên tîmên taybet de, li Cizîr, Nisêbîn, Amed û Êlihê û bajarên din 96 kesan jiyana xwe ji dest da.

Newrozê ber bi dawiya salên 90'î ve ji aliyê partiyên siyasî yên demokratîk ve hatin organîzekirin. Li qadan bi coş hat pîrozkirin. Di serî de li Amedê, li temamiya bakurê Kurdistanê qadên Newrozê bûn qadên berxwedana li dijî faşîzmê.

Di sala 1999'an de piştî rêberê PKK'ê bi komployê teslîmê Tirkiyeyê hat kirin, Newroz ji aliyê dewletê ve dîsa hat qedexerkirin. Lê gel wê salê ji bo hêrsa xwe ya li dijî komployê nîşan bide bi hêrseke mezin daket qadan.

Di sala 2000'î de ku PKK'ê agirbest ragihandibû, li bajarên bakurê welêt bi sedhezaran meydan tijî kirin. 2002'yan bi milyonan kes li qadên Newrozê azadiya Oclan qîriyan û ji bo çareseriyê bang kirin.

2004'an gelê kurd li qadên Newrozê li dijî netewe-dewletê îşaret bi Konfederalîzma Demokratîk kir. 2007'an êrişa fizîkî ya li dijî birêz Ocalan bi dirûşma tenduristiya Ocalan tenduristiya me ye hat rûreşkirin. Dirûşma sala 2008'an li dijî înkar û îmhayê pêngava Êdî bes e bû.

2010'an gelê kurd li qadên Newrozê deklere kir ku muxatabê çareserî û şer Ocalan e. 2011'an dirûşm û şiara gel an ‘azadî an azadî’ bû. 2012'an gel hemû bendên hikûmeta tirk derbas kirin, herikîn qadên Newrozê û israra xwe ya di azadiyê de nîşan da. Sala 2013'an Kurdistan bûbû Amed, çavê dinyayê hemû lê bû. Li wir Manîfestoya azadiyê ya rêberê PKK'ê Ocalan hat xwendin.

Newroza 2016'an di atmosfereke wisa de hat pîrozkirin ku hikûmeta tirk dest bi şerekî topyekûn kir û digot wê kurd danekevin qadan, lê kurd bi çalakiyên xwe hesabên wan xera kirin. Sala 2018'an êrişên li dijî Efrînê hêrsa kurdan zêdetir herikand meydanan.

Newroza 2019'an bi şiara ‘em ê teqez bi serkevin û tecrîdê bişkînin’ hat pîrozkirin. Sala 2020'an ji ber pandemiyê milyon daneketin qadan lê dîsa jî agirê Newrozê li gelek deveran bi coş hat vêxistin. Newroz îsal bi ruhê serketina Garê hat pîrozkirin û kurd wê bi yekdengî azadiyê biqîrin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Meha adarê û berxwedan

Di dîroka her neteweyê de hin roj an jî hin demên pir biwate hene. Bi demê re, ev roj di nav gel de veduguherin nirxên civakê. Di dîroka gelê kurd de jî rojên wisa bi wate û nirx pir in. meha adarê sembola van roja ye.

Ji bo gelê kurd meha adarê, meha şîn û şahiyê ye, meha jenosîd û serkeftinê ye, meha dagirkeriyê û têkoşînê ye, meha Newroz û azadiyê ye, meha enfal û edaletê ye.

Bi kurtahî ev meh, qasî ku sembola zilm û zordariyên hatine serê gelê kurd, her ewqas jî berxwedan û têkoşîna azadiya gelê kurd vedibêje. Di vê mehê de gelê kurd dibe xwedî hêza berxwedan û azadiyê.

Di destpêka meha adarê de gelê Kurd ji milekî ve bi dehhezaran qurbaniyên di enfalê de jiyana xwe ji dest dane bi bîr tîne ji aliyê din ve jî salvegera raperînên li dijî dîktatoriya rejîma Baasê pîroz dike.

12'ê meha adara 2004'an li rojavayê Kurdistanê gelê kurd cara yekem li dijî rejîma zilmkar serî hilda. Ji wê rojê vir ve gelê kurd vê rojê bi rihê serhildanê pêşwazî dike.

Gelê kurd 16'ê vê adarê de ji bo qurbaniyên Helebçeyê reş girê dide. Li ser vê xemgîniyê bi hêrseke mezin ve li dijî dagirkeriya Efrînê serî hildide.

21'ê Adarê li dijî Dehaqên hemdem dengê têkoşîn û berxwedana rihê Mazlûman geş dibe. Di vê rojê de li tevahiya welat gel dadikeve qada û dengê azadiyê diqîre.

Gelê kurd bi sedan salan e li ser vê axa pîroz, li gorî kevneşopiyên xwe xwedî li çand û hebûna xwe derdikeve. Hêzên metînger ên dixwazin siberoja gelê kurd tarî bikin, hewl didin di vê rojê de derbeyên mezin lê bidin. Tevî hemû êrişan jî gelê kurd bi rihê Newrozê ve di xwe de hêza jinûveavakirinê dît û li dijî van êrişan derket.

Lê hêzên mêtinger li Kurdistanê ji bo vê mêhê bi temamî bikin meha şînê û reş bikin, serî li her cure qirêjiyê didin.

Îro êrişên li ser Partiya Demokratîk a Gelan nîşaneya vê yekê ye. Ji milekî ve, ji bo îradeya siyasetmedarên di bin banê HDP'ê de faaliyetên siyasî didin meşandin bişkînê, êrişa dibin ser parlamenter û endamên HDP'ê, ji milê din ve jî bi destê dadgeha ku di destê rejîma AKP-MHP'ê de bûye amûreke tolhildanê dixwazin siyaseta demokratîk bê bandor bikin. Çawa ku ev êriş ne jixweber in, di vê demê de pêşxistina wan jî ne ji rêzê ye. Li Kurdistanê her bûyer û pêşveçûnên diqewimin ji nêz ve bi siyasetê re eleqedar in.

Ji ber vê yekê, çawa ku ev hemû pêşveçûn û bûyerên li herêmê diqewimin bi hev ve girêdayî ne, îdiayên der barê jiyana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de jî ne ji rêzê ne.

Armanc û hewldanên neyarên gelê kurd diyar e. Ew dixwazin di nav gel de îradeya têkoşîn û berxwedanê bişkînin, têk bibin. Lewma li dijî van êrişên siyasî, leşkerî û şerê psîkolojîk divê gelê kurd bi rihê meha adarê tevbigere û xwedî li hebûna xwe derkeve.

Meha adarê vê yekê li ser me kurda ferz dike. Divê em bizanibin, li ser vê axê ji derveyî berxwedan û têkoşînê rê me nagihînin azadiyê. Ger daxwaz û armanca me li ser vê axa pîroz bi awayekî azad jiyîn be divê em li gorî çanda Arî, li gorî rihê Newrozê tevbigerin. Gelê kurd ji tekoşîn û berxwedana xwe tavîz nade. Lê neyarên gelê kurd jî ji bo di civakê de asta têkoşînê bişkîne, wê serî li her cure qirêjiyê bide. Desthilatdarên li ser postê desthilatdariyê rûniştine, bi van êrişan dixwaze emrê xwe dirêj bike. Êrişên li ser HDP'ê pêş dikevin nîşaneya vê yekê ye.

# Hevdîtinên Misir û Tirkiyeyê

Navenda Nûçeyan

Tirkiye ji sala 2013'an vir ve, piştî çûyîna Muhammed Mursî bi Misirê re hemû têkiliyên xwe qut kiribû û bi siyaseteke tund dijberiya Abdûlfetttah Sîsî dikir. Tirkiye bi vê nêzîkatiya xwe ya li hember Misirê navbera xwe û Erebistana Siûdî jî xera kiribû. Piştî 8 salan polîtîkayên Tirkiyeyê yên li hemberî Misirê di derbekî de guherîn û Tirkiyeyê daxwaza hevdîtinan ji Misirê kir.

Der barê destpêkirina têkiliyên Misirê û Tirkiyeyê de me bi rojnamegerê li Misirê Şiyar Zaxo re axivî.

Şiyar Zaxo diyar kir ku hevdîtin bi israr û daxwaza Tirkiyeyê pêk hatiye û wiha got: "Daxwaza Tirkiyeyê wek gavek erênî hat dîtin. Bi giştî şîroveyên mîna çima di demek wiha de Tirkiye daxwazek bi vî rengî kiriye, hebûn. Wezîrê karê derve Samih Şikrî jî di axaftineke xwe de got ku baweriya wan bi gotinên Tirkiyeyê nayê, hewce ye em emelê Tirkiyeyê bibînin."

**'Misir xwe giran dike'**

Rojnameger Zaxo der barê şertên Misirê yên ku ji Tirkiyeyê xwestin ragihand ku ev xwestek tên wateya lewaziya Tirkiyeyê û ev tişt anî ziman: "Misir ji Tirkiyeyê daxwaza qûtkirina têkiliyên bi wan grupên islamî yên li Tirkiyeyê dike û bi taybetî komên ku alîgirên Îxwanî Mislim bûn û berê xwe dabûn Tirkiyeyê wan teslîmî Misrê bike. Şerteke Misirê ya din jî ew bû ku çeteyên Tirkiyeyê ji Sûriyeyê anîne Lîbyayê û eskerên xwe ji Libyayê derîne. Eynî tiştî ji bo Sûriyeyê jî xwestine. Şerta dawî jî ew bû ku destê xwe ji karên navxweyî yên ereban bikişîne. Piştî van şertan encex Misir bi Tirkiyeyê re peywendiya xwe dikare deyne. Helbet ev daxwazên fermî bûn lê li pişt perdeyan jî hin hevdîtin di navbera her du aliyan de pêk hatin, ev jî di milên istîxbaratî de bûn. Bi taybetî ji ber ku Tirkiye lewaz e dê Misir li hemberî vê lewaziyê xwe giran bike."

**Îsraîl dê êdî piştgiriyê nedê**

Şiyar Zaxo di berdewama axaftina xwe de dest nîşan kir ku li Rojhilata Navîn Şerê Cîhanê yê Sêyemîn tê jiyîn û wiha qala sekna Îsraîlê ya demên dawî kir: "Tê zanîn di sedsala 20'î de Tirkiye li Rojhilata Navîn wek qerekoleke hêzên navneteweyî li hember Sovyetê û ereban dihat bikaranîn. Lê ya niha, herêm di qonaxeke nû de ye. Ew rola Tirkiyeyê ya ku wek berê Îsraîl destek bidê nema. Hem êdî Îsraîl jî ne wek berê ye. Îsraîl bi hevpeymanên Ebraham her çû bi hêztir bû. Di demên nêzîk de dewletên ereban jî hevpeymanên aştiyê bi Îsraîlê re çêkirin. Bi vî awayî jî her diçe rola Tirkiyeyê kêmtir dibe. Berê Îsraîlê pişta xwe dida Tirkiyeyê û li hember ereban bi kar dianî. Niha têkiliyên ereb û Îsraîlê bi peymanên aştiyan her çû xurtir bûn. Ji ber vê yekê jî ez yeqîn nakim ku navbera Îsraîl û ereban xera bibe. Wisa xuya dike dê her biçe li herêmê rola Misirê mezintir bibe. Yanî Misir dê bibe hêzeke herêmî. Êdî hêzên li Rojhilata Navîn û navdewletî hêdî hêdî dev ji Tirkiyeyê berdin."

**Dibe ku Tirkiye bê darizandin**

Rojnameger Şiyar Zaxo da zanîn ku dê hevdîtinên Misirê û Tirkiyeyê zêde bandor li Rojhilata Navîn neke û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji ber ku nakokiyên di navbera her du aliyan de pir in, ez ne di wê baweriyê de me ku têkiliyeke bi lez û bez pêk were. Tirkiye dê nikaribe van şertên Misirê bi cih bîne. Her kes dizane ku niha Tirkiye li Libya, Deryaya Spî, Sûriye, Iraq û Sûdanê têk çûye. Yanî bi giştî hem Biden hem jî dê Ewropa ji bo Tirkiyeyê biryarê bidin. Wisa xuya dike ku li pêşiya Tirkiyeyê rojên darizandinê xuya dikin. Ev yek jî dibe sedema ku dewletên navneteweyî êdî dê ji aliyê têkiliyan ve xwe ji Tirkiyeyê dûr bixin. Piştî bûyera Garê jî dewletên navneteweyî êdî bi çavekî cuda li hêza leşkerî ya Tirkiyeyê mêze dikin. Ji ber vê rewşa Tirkiyeyê ya lewaz dê hê zêdetir wî bi kar bînin û şertên cuda deynin pêşiya Tirkiyeyê."


# Newroz pîroz be!

Newroz hêvî û daxwazên me yên azadî û aramiya civaka me geştir û mezintir dike. Bi germahiya ruhê Newrozê em bi hestên azadî, aramî, aştî û wekheviyê cejna Newrozê di serî de li gelê kurd û li hemû gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin.



Dayikên Aştiyê

# Newroz pîroz be!



Mizgîniya buharê Newroz, sembola jiyana azad, aştiyane û demokratîk e. Bi hêviya aştî, biratî û azadiyê Newroza gelê me pîroz be.

ÇINAR BELEDİYESİ 1937

Şaredariya Çinarê û Endamên Meclisa Şaredariyê

# Newroz pîroz be!



Newroz navê rojên xweş û azad e. Em hêvî dikin ku agirê Newroza 2021’ê li welatê me jiyanê ronî bike û bibe wesîleya azadî û aştiyê. Bi van hestan, em ji bo gelê xwe jiyaneke xweş û azad, aştiyeke birûmet û tenduristiyeke baş dixwazin. Em cejna Newrozê li gelê kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin.

KESK 1995

Platforma Şûbeyên KESK’ê yên AMED’ê

# Newroze ti çi şêrîn a...

Helîn Uzel



Ma her serre paweyê ameyîşê Newroze yî û ma zanenê ke a her serre newe ra ganî bena û yena. Her serra ke wesar yeno zî kelecanêko pîl dano ma pêronan. Çimkî nê demserrî de roşanê kurdan Newroze yeno bimbarekkerdene.

Wisar heme rindekîya gerdûne mîyanê xo de hewêneno û heme gandaran reyde bare keno. Barekerdişî reyde pîl beno, pîlbîyayîşî reyde zî azad beno. Rixmê heme talanê xozayî zî, eşqê cuwîyeyî bêpeynîya. Bi ameyîşê wesarî xoza, xo newe ra ganî keno û heme rengê cîya-cîyayî xozayî sey veyveke xemilnenê. Verê, bi vaşan û vilikan rîye xo nawneno. Dima ra zî seke vajo “Ez îtîya de ya. Ez newe ra yeno xo ser” bi gul, vilik û daran xo xemilneno û boya xo vila keno her ca. Wesare de vewre helîyena û xoza newe ra xo awan keno. Çem û robarî herikîyenê û bena gurme gurmê awe…

Cenî zî sey wesarî ya. La cenî, her serre nê, her aşme xo newe ra awan kena. Tebîetê cenî û xozayî zaf manenê yewbînan. Pêroyê taybetîyê xozayî cenîyan de estî. Coka tarîx ra nata cenî û xoza yew ameyî hesibnayîş û zihnîyeto serdest wexto ke hêriş keno cenîyan, sere de xoza talan keno û dima ra qetlîyam pê ano. Serdestê verêne daxî zanayêne ke desthilatdarî bi kolekerdişê cenîyan mumkun o. La cenî tarîx ra nata sey wesarî xo newe ra awan kerde û eynî wextî de çar demserran cuwîyena. Bi hezaran serrî yo ke hêrişê vera cenîyan nêqedîyayî. Çimkî hezaran serrî yo ke cenî vera serdestan de çok nêrona û têkoşîn da. Ameyîşê wesarî, yena wateya newebîyayîşî. Regl bîyayîşê cenîyan zî yena wateya cuwîyayîşî. Wesara tewr rindek Mezopotamya de ya, çimkê axa Mezopotamya çimeyê cuwîyeyî ya. Civatbîyayîş, na ca de pêk ame.

Reyna wesar, seba ma Newroz a. Verîya mîlade, serra 612. de, bi verkêşîya Kawayo Asinkar verva zilmê Dehaqî, adir tafina. No adir nêy 2 hezar û 633 serrî yê berzêr beno. Seba şar û civatê na axa qedîme wateya Newroze cîya ya. Newroze seba kurdan newe ra bîyayîş, serrewedartiş û xoverdayîş a. Na ra 40 serrî ra ver, Kawayanê hemdemî zindana Amedî de bedenê xo da ver bi adirê Newroze û tekoşîna azadîye berzêr kerdî. No adir zindanî ra, ro hemeyê civatî vila bi û bî serrewedartiş. Coka merdim wazeno na roje bi heybet verwazî bikero, bi govendê azadîye reyde, silam bikero. Dehaqê nê demî zî, berzbîyayîşê adirê Newroze ra her tim tersayî. Înan her çende ma rê Newroze qedexe kerd, ma wina zaf wayir ro Newroze vecîyayî.

Şarê kurd serranê 90an ra nata, rixmê heme astengî û qedexeyan bi coşêko pîl Newroze firaz keno. Heta ewro na oxir de zaf berdêlî ameyê dayene, la şar qet firazkerdişê Newroze, bîyayîş, serrewedartiş, xoverdayîş, ango Newroze ra fek vera nêda. Newroze ti çi şêrîn a.

Tekoşînê azadîye yê cenîya kurde, erjê rindikîye ro erjanê Newroze zêdnena. 8ê Adare de, cenîyanê kurde nîşan da ke ê hêza tewr çalake ya tekoşînê azadîya cenîyan yê dinya yê. Bi no sebeb bi ke, Newroza 2021. Bi gîyanê azadîya cenîye, ame firazkerdene.

Dîyar beno ke no wesar, azadîye ano…

# Rêxistina HDPyî ya Çewlîgî: Gergerlioglu tena nîyo

Seke yeno zanayene derheqê wekîlê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Kocaelî Omer Faruk Gergerliogluyî de qerarê wedarnayîşê wekîlîya ci ame dayene û no qerar Heyetê Pêroyî yê Meclîsî de ame wendene. Heto bîn de bi aşmano ke îqtîdarê AKP û MHPyî qala padîyayîşê HDPyî kerdêne. Serdozgerê Komare yê Mehkemeya Berze Bekîr Şahînî semedê qefilnayîşê HDPyî Mehkemeya Qanûnê Bingeyî de dewa akerde. Rêxistina Bajarî yê Çewlîgî yê HDPyî semedê bale antişê wedarnayîşê wekîlîya Gergerlîogluyî û muracato ke semedê padîyayîşê partîya înan ame kerdene, eşkerayîyêk daye.

Wekîlê HDPyî yê Çewlîgî Erdal Aydemîr, endamê Meclîsî yê Partîya HDPyî Murat Aydin, endamê Heyetê Rayraberdişî yê Merkezî (MYK) Velî Saçilik û xeylê hemwelatiyî tewrê eşkerayî bîyî.

Eşkerayî verê awanîya partîye de hetê wekîl Erdal Aydemîrî ra ame dayene û wina ame vatene: “Dest medêne îradeya mi. Omer Faruk Gergerlioglu tena nîyo. Caardişê vera partîya ma bêhuqûqî yê. Herkes nazeno ke serra 2008î de semedê padîyayîşê AKPyî û sîyasetî ra dûrîfînayîşê Erdoganî dewa ameybî akerdene. La çi heyfo ke ê ke raştê nê caardişan ameyî ewro bîyî sey makînaya zilmî û wazenê partîya mi padî. Wekîlê ma Gergerlioglu merdimêko samîmî yo û eynî wext de doktor o. O zî mexdurê KHKyî yo. Gergerlioglu semedê caardişê edaletî, heq û huqûqî têkoşîn dayo. Teda, neheqî û zilmê ke yenê kerdene, nêeşkenê ma têkoşînê demokrasî, aşitî, yewî, heqê û edaletî ra dûr bikerî.” ***ÇEWLÎG***






# Walîtî semedê Newroza Dêrsimî tena destûrê eşkerayî da

Komîteya Amadekarîye ya Newroze semedo ke 21ê Adare de saet 11.00î de Newroze bêra pîrozkerdene, muracatê walîtîye dabî. Walîtî pandemî kerd bahane û tena destûr da ke eşkerayî bêra dayene. Pîrozkerdişê Newroza Dêrsimî de destûr nêdîya ke hunermendî bivejîyî sahne ser û konser, pankart û siloganî ameyî qedexekerdene.Goreyê çareweya bernameyî wekîlê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Dêrimî Alîcan Oncu, endamê Heyetê Rayraberdişî yê Merkezî (MYK) Velî Saçilik, Sultan Ozcan, Hetkara Serekê Pêroyî yê Partîya Kede (EMEP) Selma Gurkan, Serekê Şaredarîya Dêrsimî Fatîh Mehmet Maçoglu Raşteyê Seyîd Rizayî de tewrê pîrozkerdişê Newroze benî. ***DÊRSIM***

## Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Aqilê Xoceyê Xasî

Erê her kes zano Xoceyê Xasî mewlûd açarnawo kirmanckî, ma qalê ene joy nêkerin. Ma qalê aqilê ê, jiyaney ê, tesîrê ê ro dewrê cê, dewanê dewrê Hezanî (dewey Liceya Amedî) bikerê ke wa baş bêro famkerdişî.

Eno hefte nimûneyke ma esta. Ene nimûne aqilê ê, tesîrê ê ro dewrê xo nîşan dana. Fermo ma dest pa bikerin…

‘Dare ra peye be’

Vanê merdimê ke zehf xeberî dayêne, hema çi biyameyêne fekê cê, bê ke biwezno, bê ke sero bifikirîyo hema vatêne. Re rey dima ra poşman bîne la a poşmanî hendî nêgeyrayêne a. Rojan ra rojekê eno merdimê ma biyo esparê herî, rey xo ra şino. Nêşka ra vano, “Bi telaq ez herî ra peyebî go pîrekey mi bêra veradayîşî.” Erê, ana vano la wexto ke yeno xo ser fam keno ke şaşî kerdo. Ê, pîrekey xo ra zî hez keno. Go seyîn bo? Nêftareno bêro war, çimkî bêro war pîreke şina… Bi saetan serê paştey herî de maneno. Dima ra şino verê melayê dewe ke ci rê fitwayke veco. Melayê dewe ci rê nêbeno çare; şino verê pîlanê dewe, verê moxtarî, la çare çinî yo. Yew te ra vano, “Hezan de Xoceyê Xasî esto. Bibo nêbo, encax o beşko to rê çare bivîno.”

Eno merdim vano “Temam” û verê herê xo şano Hezan. Zehf-tay şino, hendî çende saetî şino, axir reseno Hezan. Keyeyê Xoceyê Xasî perseno, mocnenê ci. Wexto ke reseno verê keyeyî hawneno Xoce çiyan reyde eleqedar beno. Vano:

- Xoce qisûr mawne, ez do to karê to ra bikerî, la meselayêk mi esta. Xêrê xo ti eşkenê hetê mi bikerê?

Xoceyê Xasî verê xo dano ê û vano: Xêr o?

Mêrik vano: Wele hal û mesela anawa, hema çî hameyne mi fek mi vatêne û naweyê çîkew xirab hame fekê mi. Mi va, ‘Bi telaq ez herî ra peyebî go pîrekey mi bêra veradayîş.’ Xêrê xo mi rê çareyke, fitwayke bivîne.

Xoceyê Xasî vano: Mesela ene wa?

Mêrik vano: Erê wele, mesela tenî ene wa.

Xoceyê Xasî vano: Ê ti zî herî ra meye war.


Mêrik vano: Xoce, ez çawey nêrî war, ez do çawey serê herî de vinderî?

Xoceyê Xasî vano: Erê, herî ra mey war. Herî bere verê darêke, serê herî ra şo serê dare. Dare ra bêre war. A çaxî vatişê to betal beno, pîrekey to zî nîna veradayîşî. Rast o, ti herî ra niyameyê war, ti dare ra hameyê war.

Mêrik zehf kêfê cê yeno, hema herî beno verê dare, şino serê dare û dare ra yeno war. Mêrikê ma şino destê Xoceyê Xasî û xatir te ra wazeno.


Zey ene joy, zehf çiyê ke Xoceyê Xasî bi aqilê xo cade hel kerdê estê. Ene zî înan ra jo bî.

NOT: Nişteya verî eneyde ma vat bî “Bî 60 sere wefat kerdo” ma şaş niştbî, rastî cê 70 sereyo.



Xoceyê Xasî
(1867 an 68 - 18.02.1951)

# Newroz pîroz be!



Bi hêviya rojên xweş û azad em Newrozê pîroz dikin. Em hêvî dikin ku Newroz wekî ruh û navê xwe bibe rojeke nû di jiyana gelên bindest de. Hêvî û daxwaza me ew e ku Newroz wekî rengê buhara xwezaya xwe ya bedew û rengîn bi xwe re aştiyek birûmet, wekhevî û azadiyê bîne. Bi van hest û hêviyan em cejna Newrozê li gelê xwe pîroz dikin û ji dil û can dibêjin Newroz pîroz be.

SİLOPİ BELEDİYESİ 1960

Hevşaredar û Endamên Meclisa Şaredariya Silopiyayê

# Hin stranên sembol ên Newrozê

Bêrîvan Kayi

**Stranbêj û helbestvanên kurd ji bo Newrozê li Kurdistanê û derveyî welat heta niha bi hezaran helbest nivîsîne û stran çêkirine. Bi taybetî stranên Hesen Zîrek, Eyaz Yûsif, Aram Tîgran û Mizgîn bûne sembola Newrozê**

Têkildarî cejna Newrozê û pîrozkirina Newrozê li Rojhilata Navîn bi hezaran helbest, çîrok hatine nivîsin û stran hatine strîn. Çanda pîrozkirina Newrozê ji 2 hezar û 600 salî zêdetir e ku li ser axa qedîm ji aliyê gelê arî ve wek cejnekê hatiye pîrozkirin. Ev çanda Newrozê û rîtûelên din çandek e ku ev hezar sal in xwe spartiye çanda devkî û heta roja me ya îroyîn jî berdewam kiriye. Lê helbet di çanda devkî ya bi hezaran sal in didome de, bi demê re reng û şêweyên hin seretayên çandî guherîne, hin winda bûne û hin ji wan jî belav bûne.


Dema em li gor şert û mercên erdnîgariya Kurdistanê mêze dikin jî xuya ye ku gelê kurd bi hezaran salan li ser çiyayan, li gund û bajaran agir pêxistine û 'roja nû' bi stran, kilam û rîtûelên bi vî rengî pîroz kirine. Di sedsala 16-17'emîn de ji helbestvanê kurd Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî heta gelek dîwan û helbestên din gelek kesan li ser roja 'Newroz'ê helbest nivîsîne. Bêguman çanda pîrozkirina Newrozê yan jî wek cejna kurdan pîrozkirin, bi salan e ku li çar parçeyên Kurdistanê berdewam e. Heta niha di gelek nivîs û helbestên kurdî de qala 21'ê Adarê û cejna kurdan hatiye kirin lê mixabin bi sedemên ku awaz bi notayan nehatine qeydkirin ango nivîsîn, negihaştine roja me ya îro. Êdî di salên 1930'yî de awaz, helbest, çîrok û stranên kurdî hatine qeydkirin. Bi tevahî em dikarin bêjin ku stranên têkildarî Newrozê yên 70-80 sal berê ne.

**Naveroka stranên Newrozê**

Stranbêj û helbestvanên kurd bi ji bo Newrozê li derveyî welat û her çar parçeyan heta niha bi hezaran helbest û stran nivîsîne. Em dixwazin bi taybetî li ser stranên ji bo Newrozê hatine nivîsin bisekinin. Reng û naveroka stranan li ser Newrozê li gor şert û mercên Kurdistanê jî tim di nav guherînekê de ne. Bi tevahî stranên heyî xwedî naverokeke neteweyî, çandî û polîtîk in. Dema em dêhna xwe didin stranên Newrozê yên li Başûr hin stranên gelerî tim li pêş in lê Bakur hema her sal ji bo pîrozkirina Newrozê bêtir stranên polîtîk hatine nivîsin û bi taybetî ev yek bi salan 80'yî ye rê zêdetir bûye. Bêşik sedema vê jî ew e ku Newroz di heyamên şoreşê de wekî qadeke polîtîk hatiye ditîn. Yanî bi dîroka Tevgera Azadiyê re bi taybetî li Bakur û li Rojava bi hevokên berxwedanê û tekoşînê stran hatine nivîsin û bi van stranan Newroz hatiye pêşwazîkirin.

**'Newroz'a Hesen Zîrek**

Dema em bala xwe didin stranbêjên ku stran li ser Newrozê gotine pêşî Hesen Zîrek tê bîra mirov. Zîrek yek ji wan hunermendan e ku wek kaniya stranên kurdî jî tê nasîn. Tê gotin ku nêzî hezar û 500 stranên Zîrek hene. Her çiqas ku hemû stranên wî heta roja me nehatibin jî hunermendekî ku em dikarin wek stûneke hunera kurdî pênase bikin. (awazên gelek stranên wî ji aliyê kesên wek Ruhî Su, Candan Erçetin, Yavuz Bîngol û Îbrahîm Tatlises û hwd. ve hatine dizîn!) Strana Hesen Zîrek a bi navê 'Newroz' (helbesta Pîremêrd e) sembola Newrozê ye. Di vê stranê de Pîremêrd bi hestên neteweyî qala roja Newrozê dike.



**'Newroz hat bi gul û rihan'**

Piştî 'Newroz'a Zîrek, stranbêj Eyaz Yûsifê Zaxoyî di salên 1980'yî de strana xwe ya bi navê 'Newroz hat bi gul û rihan' dinivîse. Kaseta wî ya ewil di sala 1982'yan de derket û bi wê kasetê li nav û dengiya xwe diyar kir û di salên 1983, 1984 û 1985'an de jî kaset çêkirin. Eyaz bi tevahî 4 kaset çêkirine û stranên wî yên heyî jî bi dehan salan in ku li her parçeyekî Kurdistanê tên guhdarîkirin. Bi taybetî jî stran û klîba wî ya herî tê nasîn jî 'Newroz hat bi gul û rihan' e. Eyaz Yûsif ji aliyê rejîma Baasê ve tê qetilkirin.

**Salên 90'î û stranên Newrozê**

Helbet em ê yek bi yek qala her stranbêjên kurd ên stran li ser Newrozê çêkirine nesekinin. Di salên 90'î de êdî bi pêşketina xeta berxwedanê bi taybetî li Bakur Newroz êdî cejna neteweyî û bi taybetî jî roja berxwedan, serhildan û azadiya gelê kurd tê pîrozkirin. Dema em bala xwe didin stranên wan salan, bi taybetî hem jiyana hunermendan hem jî di naveroka stranên wan de xeta polîtîk a stranan derdikeve pêşberî me. Aram Tîgran, Ciwan Haco, Mihemed Şêxo, Şehrîbana Kurdî, Nasir Rezazî, Eyşeşan, Koma Amed, Koma Dengê Azadî, Koma Agirê Jiyan, Mizgîn, Koma Berxwedan, Seyîdxan, Zozan, Xelîl Xemgîn, Necmeddîn Xulamî, Birader, Canê, Şemdîn, Şehîd Sefkan, Koma Çiya, Dilgeş, Çarnewa û bi dehan hunermendên din ku der barê Newrozê de stran çêkirine.

**Cejna gelê kurd**

Roja me îroyî, roja 21'ê Adarê Newroz li çar perçeyên Kurdistanê bi coşeke mezin tê pîrozkirin. Li her bajarekî kurdan û li dora her agirekî hê jî stranên Hesen Zîrek, Eyaz Yûsif û yên salên 90'î cejna Newrozê tê pîrozkirin. Lê helbet li Newroza Amedê bi sedan hunermend her sal ji bo Newrozê stran û awazên nû çêdikin.





# Kovara Kurdeçîrokê dest bi weşanê kir

Felat Niştiman

Li bakurê Kurdistanê kovargeriya kurdî di dîroka ziman, wêje û siyaseta kurdî ya nêz de cihekî pir girîng digire. Di sed salên dawî de, tevî qedexekirin û bêderfetiyan, kovarên kurdî her hatine çapkirin û peywira xwe bi cih anîne. Dikare bê gotin ku kovargeriya kurdî bandoreke pir baş li ronakbîriya kurdî kiriye û heta hin ji wan bûne ekolên serdemên xwe ku hê jî li ser wan tê nîqaşkirin.



Ji kovara destpêkê ya kurdî, Rojî Kurdî (1913) heta Hawar (1932) û Tîrêjê (1979), ji Rewşenê (1992) heta Pîne (1999), Çirûsk (2007), Zirîng (2019), Psychology Kurdî (2006) û yek ji kovarên herî dawî kovara Aşdadê (2021), di gelek warên cihêreng de bi dehan kovar derketine û hê jî dertên. Kovara Kurdeçîrokê jî yek ji wan kovaran ne û roja Newroza îsal hejmara wê ya yekê derket.

Nîvîskar Mehmet Dîcle ku bi çîroknivîsiya xwe tê nasîn û her wiha edîtorê kovara Kurdeçîrokê ye, pirsên me yên têkildarî kovarê û çîrokan bersivandin.

**'Ziman bi çîrokan kemiliye'**

Nivîskar Mehmet Dîcle pêşî behsa girîngiya çîrokan kir û anî ziman ku beriya hemû cureyên hunerê çîrok hebûye, ziman bi çîrokan kemiliye û wiha got: "Kilam bixwe jî çîrok bûne, rismên hatine xêzkirin jî her tim qala çîrokekê kirine ji me re. Bi sedan salan dîrok bixwe jî bi awayekî çîrokî hatiye vegotin. Loma jî çîrok hîmê herî qehîm ê ziman e û qodên neteweyan di çîrokên wan de veşarî ne. Her çiqas di roja me de çîroka nûjen ketibe dilqên cuda jî ew mesîlka herî xurt a hunerê ye."

**Bi çîroka Fûad Temo dest pê kir**

Dîcle bal kişand ser çîrokên modern û çîrokên anonîm û destnîşan kir ku çîrok yek ji cureyên wêjeya modern in û di kurdî de ji ber navê xwe bi xebroşkan re ango bi çîrokên anonîm re tê tevlîhevkirin. Dîcle diyar kir ku ew xebroşkan nabêjin, berhevkariyê jî nakin û wiha domand: "Ne ku gotina xebroşkan tiştek biçûk e, ew disiplîneke din e. Ji ber ku civaka me hê jî ji nivîsandinê û xewendinê dûr e û wêjeya devkî hê jî cureya serdest e, cureyên wêjeya modern di bin siya tiştên devkî de mane. Çîroka modern ji sedsalî zêdetir e ku bi Fûad Temo dest pê kiriye (me jî bi çîroka wî dest bi kovara xwe kir) û di roja me de jî di nav wêjeya kurdî de bûye xwedî nasnameyek payebilind."




Nivîskar Dîcle têkildarî kurteçîrokan jî axivî û anî ziman ku kurteçîrok damareke xurt a wêjeya kurdî ya modern in û gelek nivîskarên bi kurdî kurteçîrokan dinivîsin û her wiha gelek xwendevanên ji xwendina çîrokan hez dikin, çîrokên kurdî yên nûjen û yên cîhanê dişopînin hene.

**Wergera çîrokên cîhanê**

Dîcle destnîşan kir ku bi kovarê armanca wan a sereke xurtkirina çîrokên kurdî ye û ew dixwazin bi kovara xwe Kurdçîrokê cîhana çîrokan geş bikin û wiha pê de çû: "Em dixwazin hem bila çîroknivîsên kurd bi hêsanî çîrokên xwe bigihînin xwîneran, hem jî çîrokên cîhanê bi kurdî bên wergerandin ku ji bo zimanê me xurtir bibe û hem jî dikaribin wêjeya cîhanê bi kurdî bixwînin û bişopînin. Helbet yek ji armancên me yên demdirêj jî ew e ku ev kovar emirdirêj be û dikaribe ji bo çend nifşan bibe dibistana çîrokan."

Di berdewam axaftina xwe de, Dîcle destnîşan kir ku çîrokên moder ên kurdî li gorî gelek çîrokên gelên din hê negihîştiye asta ku ew dixwazin û wiha got: "Em bawer in ku nivîskarên kurd ên nûhatî wê derfetên zimanê kurdî baş bi kar bînin, civata xwe baştir nas bikin û wêjeya cîhanê baş bişopînin û bi vî awayî çîrokên kurdî jî wê bigihîjin asteke pir bilindtir."

**Teoriya çîrokan û rexneya pirtûkan**

Nivîskar û edîtorê kovarê Dîcle herî dawî diyar kir ku wê kovara wan bi awayê kaxid sê mehan carekê derbikeve û wiha got: "Wê di kovara me de hem çîrokên kurdî hem jî yên cîhanê hebin û her wiha nivîsên li ser teoriya çîrokan, rexneyên pirtûkan û hevpeyvîn jî hebin."

xwebûn

22-28 Adar 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 66

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazışleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz İbrahîm Mirzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo aboneтiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Yezdanên welatê jorîn 2



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Fermandarê gewre yê efsanewî Hannîbal gotiye: "An em ê riyekê bibînin, an jî em ê riyekê çêbikin."

Ew roj û ev roj e, ev gotina Hannîbal a qerase, ev gotina mîrî, ev gotina efsûnî, bûye pizika serê zimanan. Kesê piçekî giyanê şoreşgerî pê re hebe, gava roj li wî/ê di cihekî teng de lê diçe ava, hingê vê zir-gotina Hannîbal tîne bîra xwe. Ev gotina ew çend qelew, meriv tije dike, ew çend jî meriv dicixirîne. Gava ev gotin tê bilêvkirin, ne bi werîsekî, bi heft werîsan meriv nayê zeftkirin.

Ger em qinê ji galegalê derxînin, ger em maka gotinê ji hevdu re bibêjin, mijara gotinê lêkolîna cih warên çetin ên Naîriyan-Bîanîliyan-Xaltiyan-Ûrartûyîyan e. Sernivîsa vê gotarê "Efendiyên welatê jor 2"ye. Dibe hinek ji we bibêjin, bavo ma gotara "efendiyên welatê jor 1" çi çax bû hat weşandin, heta em ji ya duyemîn fêm bikin? Hûn gelek mafdar in. Ez tavilkê bibersivînim: Tam salek û 18 roj berê hatibû weşandin. Ew roj û ev roj, derfetê me çênebû heta em biçin welatê efendiyên welatê jor, lêkolîna xwe ya nîvcomayî bibin serî. Lewra şewba Covîd19'ê, salekê salawext em di malên xwe de dîl girtin.

Piştî hinekî berge li vê şewbê teng bû, vêca zivistana duyemîn di ser me de hat. Bi vî awayî em cara duyemîn lebikîn. Nola gayê mîz lê biesire, dawî li kêşeyan nehat.

Paşê ev gotina fermandar Hannîbalê mezin, mîna hesteyek di tariyê de were çelpandin, wanî pirîskên vê gotina "an em ê riyekê bibînin, an jî em ê riyekê çêbikin" di pîstika mejûyê min de vejenî.

De vêca ne taqozek, heft taqozî jî nikarîbû tekerê erebeya me bisekinanda. Bi vî awayî me ji berfa welatê jor û ji şewba Covîd-19'ê re got, qaqibixo lawo qaqibixo!

## Wan

Ger hûn bixazibin bi dilê xwe li cih warên Ûrartûyan bigerin, divê hûn Wanê ji xwe re wekî navend bibijêrin. Lewra Wan, nîvê kevçika dilê Ûrartûyan e. Ewil biçin ber Dergehê Yezdan Xaldî û wî dergehê pîroz tewaf bikin. Bi rêzdarî li ber bîrdariya seryezdanê cengê Yezdan Xaldî, yezdanê ba bager û birûskê Yezdan Teîşeba, yezdanê rojê Yezdan Şivînî, her 60 yezdanên din û her 16 xwedawend, li huzûra wan niyaz bibin û têkevin qametê. Çiqas dia û dîrozên hûn pê dizanin ji hezkiriyên xwe re bixwînin. Piştî hingê daxilî tunêla dem û dewranan bibin. Hingê hûn ê derkevin ger û geşta rabirdûya sê hezar sal beriya niha.

Hingê hûn ê li xwe vehesin ku bedena we nola per, nola pîşo nerm bûye, sivik bûye. Lewra Dergehê Yezdan Xaldî, navê xwe yê din Dergehê Meherê, bi serê xwe manîfestoyeke baweriyê, manîfestoyeke serkeftinê ye. Yezdan Xaldî, yezdanê neteweyî yê pêşiyên me yên Xaltî-Ûratûyî ye.

## Qralên Ûrartûyan

Me di gotara xwe ya yekemîn de qala çend qralên Xaltî-Ûrartûyan kiribû. Lê ji ber saleke salwext, di ser re derbas bûye, ez dixwazim hema di ser re careke din qala wan pênc qralên pêşîn yên binemala duyemîn a Ûratûyan bikim. Te dît li gorî zanebûna xwe.

Berî Zayînê ji sedsala 12'emîn heta sedsala 9'emîn li derdora 400 salî, Asûrên xwînrij hema bê navber miqîm ajotine li ser Ûrartûyan. Di serdsala 9'emîn a berî zayînê de rûsipiyekî zana, bi navê Lûtîprî radibe. Temamê aşîretên Hûrrî-Mîtanî, her wiha Sumer, Hitît, Frîg û yên din ên li hember Asûran têkçûyî, tevdekan di bin banê Ûrartûyan de dicivîne ser hev. Tifaqeke zornebir, her wiha têneçûyî, ava dike.

Paşê qralê pirzana û zîrek, qral Lûtîprî, xatirê xwe ji dinyaya gewrik dixwaze, derdikeve warê aşa. Lê ew textê xwe ji qralekî ciwan, tevhilkişandî ew çend jî çust re dihêle. Ew qralê ciwan, nûxwiriyê wî Sardûriyê yekemîn bixwe bû.

Ji navê xwe jî kifş e ku ew qralekî serdar û rêber bûye. Jixwe em di roja îroj de jî, ji hukumdaran re dibêjin "serdar".

Serdarê 1'emîn dibe qralê yekemîn yê hukumdariya Ûrartûyan ê serdema duyemîn. Qral Sardûrî, paytextê radike tîne li ser keleha li rojhilatê gola Wanê ava dike. Keleh, hezar û 800 metre dirêj e, 100 metre ji jêrzemîna erdê bilind e. Qral Sardûrî, navê seryezdanê Hûrrî-Mîtanî Teîşeba li paytexta xwe dike. De min li jorê qala vî yezdanî kiribû, ew yezdanê ba bager û burûskan e. Navê Yezdan Teîşeba/Tûj-ba, tê wateya "bayê tûj".

(Gava em qala wateya van navên dîrokî dikin ku di nav kurdiya roja me ya îroj de jî tê bi karanîn, hinek kesên xeşîm dibêjin "de hûn jî wekî tirkan nekin looo". Elebet gelek gotinên meriv ji van rebenokan re bibêje hene. Lê yeqîn bikin ne hêja ye heta meriv xwe li ber bayê wan xeşîmkokan bixîne. Tenê ez dikarim vê gotinê ji wan re bibêjim: Ew kesên wanî qutufandî û ji ber xwe ne piştrast, giha hatine, ew ê bibin buşkul û biçin)

Sardûriyê 1'yemîn jî piştî hîmekî qewîn ê hukumdariyê datîne û şûnde, ew jî ji vê dinyaya gewrik koçî warê aşa dike. Tirba wî a bîrdariyê li nîvê keleheke başûrê Tûşpayê hatiye kolandin. Tirb, ji lîwanekê û çar menzelan pêk tê.

Piştî Sardûriyê 1'emîn kurê wî Îşpûînî B.Z di navbera salên 835-810'an de dibe qralê Ûrartûyan. Qral Îşpûînî Dergehê Yezdan Xaldî dide avakirin û yezdanê bi navê Xaldî wekî yezdanê neteweyî, dihewîne. Yezdan Xaldî, di heman demê de yezdanê cengê ye jî.

Taybetmendiya qral Îşpûînî ya dîyarde ew e ku, textê hukumdariyê bi kurê xwe Menûa re parve dike. Piştî Îşpûînî, kurê wî Menûa dikeve dewsa bavê xwe.

Menûa, qralekî welê ye, ew tam gurê coav, bendav, rê û avahîsaziyên nuwaze bûye. Menûa, ji her çar hêlên paytext Tûşpayê, rê çêdike û tîne digihîne paytextê. Serbajar Tûşba, bi wan riyên xwe yên dîrokî edetî dibe nola axtapotekî dêwasa û milên xwe radimedîne her çar hêlên xwe.

Di wan riyên dîrokî yên erebeyên hespan re, mahdenê hesin tê re dikişand paytext Tûşpayê. Qral Menûa di nav xanedana Tûşbayê de, di rêza 3'yemîn de ye. B.Z di navbera salên 810-786'an de hukum ajotiye. Ji ber ku Menûa û bavê wî Îşpûînî, welatê xwe bi hev re bi rê ve birine. Her du jî di hundirê tirbeke bîrdariyê de hatine definkirin. Tirba wan, hema li tenişta tirba Sardûriyê 1'emîn e.

Piştî qral menûa, vê carê kurê wî Argiştî dibe qralê Ûrartûyan. Qral Argiştî, bi vê dîroza dîrokî derdikeve ser text: "Argiştiyê kurê Menûa bi fermana Yezdan Xaldî derket ser textê bav û kalên xwe. Bi saya yezdanê Mezin, Yezdan Xaldî Argiştiyê kurê Menûa qralê bihêz, qralê welatê Bîanîliya û lehengê bajarê Tûşpayê ye."

Qral Argiştî jî, nola bav kalê xwe wer bawer kiriye ku Yezdan Xaldî, radihiştrim û mertalê xwe yê ku guriya alava agir jê diçû, wanî bi hêbet dida pêşiya artêşê û derdiketin cengên giran.

Qral Argiştî, di şerê xwe de xezeba xwedê bûye. Nola navê xwe, dibû pêta agirê geş û bi serê dijminê xwe de dibariya. Tirba wî jî li paytext Tûşbayê ye. Li derdora tirba wî seraping ji nivîsên salnameya cengê xemilandî ye.

Nola dibêjin, mêrxas bi pirêza xwe dipeyivin. Tê gotin ku Erdîşa navçeya Wanê, navê xwe ji navê qral Argiştî wergirtiye. Ango navê Erdîşê yê berê, Argiştihînîlî bûye. Di nav demajoyê de bûye Erdîş. Piştî 22 salên qutî gurover, vêca Sardûriyê 2'yemîn derdikeve ser dika dîrokê.

## Serdema Ûrartû a zêrîn

Sardûriyê 2'yemîn B.Z di sala 764'an de derdikeve ser textê hukumdariya Ûrartû. Hukumdariya Ûrartû, di serdema Sardûriyê 2'yemîn de serdema xwe ya zêrîn dijî. Di serdema qral Sardûriyê 2'yemîn de, sînorê hukumdariya Ûrartûyan digihêje sînorê xwe yê herî berfireh. Di dîroka hukumdariya Ûrartûyan de, cara yekemîn qral Sardûriyê 2'yemîn yekser dajo li ser Asûran û li bakûrê Suriye ya îroj, artêşa Asûran li wir têk dibe. Bi hevkariya hukumdarên herêmî, sînorê deryaya Spî jî li wan vedibe.


Li ser vê serkeftina mezin, qral Sardûriyê 2'yemîn di salnameya xwe ya cengê de wiha dinivîse: "Ji bo serwer Yezdan Xaldî, Sardûriyê kurê Argiştî ev nivîs daçikandin. Bi hêza Yezdan Xaldî, Sardûriyê kurê Argiştî. Qralê bihêz, qralê bilind, qralê cîhanê, qralê welatê Bîanîliyan, qralê qralan û serwerê bajarê Tûşbayê."

Bi tîna agirê navê qral Argiştî, bi guregura pêta agirê ji rim û mertalê Yezdan Xaldî bilind dibe, Newroza we pîroz be.

Têbinî: Min di xelaka yekemîn de li ber navê ermen, di nav kevanê de "aramî" bi kar aniye. Ev bi temamî şaş e. Lêborîna xwe dixwazim.



Teîşeba — Yezdan Xaldî




***(Didome)***